

**S**uîkasta li dijî Serokê Giştî yê ÎHD'ê Akın Birdal di serî de Stenbol li gelek deverên Kurdistan û Tirkîyeyê bi çalakiyên girseyî hate protesto kirin. Li metropolên wekî Stenbol, Enqere, Îzmîr, Edene û Mersîn, bi hezaran kes gihîştin hev û sloganên wekî: "Em hemû Akın Birdal'in, Bijî biratiya gelan, Artêş ji Kurdistanê bicehime, Neçe leşkeriyê xwîna birayê xwe nerijîne, Azadî bo netewa kurd û Ji bo azadî û aşî şer şer şer!" avêtin.

Rûpel-3

*Li dijî Akın Birdal suîkast*




# Gule di aştiyê de naçin

Rojnameger Koray Düzgören:

## 'Medyaya tirk fitnekariyê dike'

Hinek mirov, der-barê rojnamegerên muxalîf de, raporên amade dikin. Ew kes listeyan derdixin û bi wan listeyan patronên rojname û televîzyonan serwest dikin û dibêjin: "Ev zîlamên we, me aciz dikin. Bila ev û ew kêmbinivîsîn. Bila ev û yê din nenivîsîn." Zordariyêke bi vî rengî li ser patronan heye. Ji dêvla ku patron li ber xwe bidin, dibin dîlên wan.

Rûpel 8-9



**Dîrok-raman:**

Yekîtiya Soveyetê û  
kêşeya Kurdistanê

R. 4

**Nirxandin-Alaattin Aktas:**

1'ê gulanê û  
Meha Şehîdan

R. 6


**Nejdet Buldan:**

Bakurê Îrlanda û  
Kurdistan

R. 5



## Azadiya WELAT



SAMI TAN

## Bûyerên nebixêr û peywira azadîxwazan

Vê hefteyê bûyerên nebixêr li pey hev hatin. Pêşî rojnameya Ûlkede Gündem bi biryara dadgeha bilind ji bo deh rojan hate girtin. Her çiqas di hejmara dawîn a rojnameyê de hatibe gotin ku ewê di 19'ê gulanê de ji nû ve derkeve, dibe ku biryarên bi vî rengî li hev werin. Jixwe hêzên dewletê ew rojname ji zû ve nedixistin bajarên di bin desthilatdariya rêveberiya ne-asayî de.

Bûyera duyemîn êrişê li ser çalakiyan 'Dayikên şemiyê' bû. Hêzên dewletê dan zanîn ku ewê rê nedin vê çalakiyê û êrişî ser beşdarên çalakiyê kirin, bîst kes girtin binçav.

Bûyera herî xeternak jî roja 11'ê gulanê li Enqereyê pêk hat. Serokê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal bi destê hêzên kontrayî hate gulbarankirin. Birdal di van demên dawîn de bûbû hedefa xapemeniya tirk. Li ser îfadeyên Şemdin Sakik ew bûbû hedefa êrişên tund. Lê wî di sa ji li gorî pîvanên mirovî û demokratîk be-

revaniya xwe kiribû. Lê xapemeniya tirk cih nedabû, gotinên wî. Lewre wî PKK wekî rêxistineke "terorîst" nedidit. Tevî hemû pirsên êrişkar ên zurnamenivîsên tirk, wî da zanîn ku PKK rêxistineke siyasî û çekdar e. Wî digot: "Em ravekirinên xwe li gorî pîvanên mafên mirovan dikin, em bi tu awayî xwe mecbûr nabînin ku li gorî pîvanên bîrdoza fermî bimeşin."

Berî vê êrişê hêzên faşîst êriş kiribûn ser ciwanên welatparêz, ji wan du heb bi destê wan hatibûn şehîd kirin. Mixabin van êrişên faşîstan bersivê li gorî daxwazê negirtibûn, lê bi êrişê li hemberî Akın Birdal derdorên demokratîk rabûn ser piyan. Bi hezaran aşîxwaz û azadîxwazên kurd û tirk ev êrişê hovane protesto kirin.

Xapemeniya tirk a ku kampanya li dijî Birdal dida meşandin, li ser vê helwesta gel, civ dan xwe. Hinekan bi durûtî xwestin berê bûyerê bidin aliyekî din. Hinekên wekî Emin Çölaşan, kujer bi amatoriye tawanbar ki-

rih. Lê gel guhê xwe neda wan. Jixwe cih, dem û rengê êrişê jî bikirên êrişê hovane ji dinimîne. Ev rastî di hemû meş û xwepêşdanan bi awayekî zelal û diyar hate zimên: Bikuj dewlet!

Êrişkar ev hêz e ku çeteyên Susurlukê, polisên îşkencekar serbest berdide, êrişî Dayikên şemiyê, rayedarên HADEP'ê dike. Êrişkar ev kes in ku guhên xwe ji hemû bangên aşîyê re digirin, operasyonên qirkirinê li seranserê Kurdistanê dimeşînin.

Li hemberî wan bikujan hevalbendîya hêzên azadîxwaz peywîrê e. Dema ew peywîr pêk were, edî çete nikarin êrişî kes û saziyên demokratîk bikin. Helwesta li dijî vê êrişê hovane hêviyê mezîna dide mirov, bi germahiya vê hêviyê em tenduristiyeke pak û lezgîn ji birêz Akın Birdal re dixwazin.

Nîşe: Dozge@rê DGM'ê di nûçeya ku di hejmara 107'an ya Azadiya Welat de hatiye weşandin hemanên sûc dîtine, doz vekirîye. Lê em ê bersiva vê îdiayê bi zimanê xwe yê zikmakî bidin wan.

Êrişkar ev hêz e ku çeteyên Susurlukê, polisên îşkencekar berdide, êrişî Dayikên Şemiyê, rayedarên HADEP'ê dike. Êrişkar ev kes in ku operasyonên qirkirinê dimeşînin.

## Îlan

## BER BI SERHILDANÊN NÛ VE

Gelên Tirkîyeyê û Kurdistanê di pêvajoyeke dîrokî re derbas dibin. Şerê di navbera dewleta tirk û hêzên di bin rêberiya Tevgera Azadiyê de, ku wekî şerê di navbera mirovahî û hovîtiyê de ye, ber bi serkeftina gelê me ve dimeşe.

Partiya me bi perspektîfa vegera li dîrok û serkeftinê; bi dirûşmeya "Di şer de serkeftin, di jiyane de azadî" konferansa xwe ya 5. ya Rojhilata Navîn li dar xist. Lewre jî vê hewldanê, rejîma şerê qirêjî xistiye nav tengasiyên mezîna. Ji ber ku ev gavên partiya me, tevahiya derewên psîkolojîk û operasyonên komara tirk vala derdixin. Dewleta ku di operasyonên fitkirinê yê Botan û Amedê de tîk diçe, dixwaze hêrsa xwe ji kesên sivîl, demokrat û saziyan derxe. Sûlkasta li dijî Serokê Giştî yê İHD'ê, parêzvanê mafên mirovan û yek ji şexsiyetên rewşenbîr ên tirk Akın Birdal jî, divê di vê çarçoweyê de bê nîrxandin. Diyar e ku, ev yek neçariya komara tirk destnîşan dike. Lê divê bê zanîn ku, êriş û harbûnên koalîsyona çeteyan bêkêr in. Çawa ku di qetilkirina Vedat Aydın de Kurdistan rabû ser piyan, divê ji bo sulkasta li dijî Akın Birdal jî gelê Tirkîyeyê rabe ser piyan. İro li ber hêzên demokratîk ên Tirkîyeyê peywîrê wiha heye. Wezîfe û peywîrên ji bo Akın Birdal serhildanên nû ne. Divê gelê Kurdistanê vê wisa bizanibe û bi serhildanên xwe yê nû, bersiva neyarê xwe bide.

Baweriya me jî heye ku wê bersivê jî bide. Hesabê guleyên ku di şexsiyeta Akın Birdal de li hêviya aşî, biratî û azadiya gelên me hatine barandin, wê bê standin. Ev êriş li dijî me hemûyan e. Em vê êrişê bi tundî em şermezar dikin. Em li cem hêzên azadîxwaz in.

Sulkasta li dijî Akın Birdal zorê dide ku hêzên şoreşger û demokrat hêza xwe bikin yek û piştgiriya xwe pêk bînin.

Têkoşîna ku terciha xwe li cem mirovahiyê daniye, wê hevalbendiyên qirêj ên çend generalên xulamê împeryalizmê, medyaya kontra û şemdînen îtirafkar bipercîqîne.

LI SER NAVÊ HEMÛ DÎLÊN  
ŞER ÊN PKK'YÎ  
SABRÎ OK - M. CAN YÜCE -  
MUZAFFER AYATA

## Mirina bi rûmet

Bavo min navê jiyaneke bindest  
Mirin li ser çavan ew mirina  
birûmet  
Şehîdê min! hêvî û hebûna min  
Li me sond û peyman e  
An her çar aliyê Kurdistan  
An mirina li goristan  
Ey dîroka pel bi qirêj-û derewan  
Rê bide em hatin  
Em kurd in û va ye Kurdistan



GARIP DILEK  
(Ciwan'14.5.1997)

14.5.1997 Garip Dilek (Ciwan) û çar hevalên wî li Sasonê gihiştine şehadetê. Di şexsiyeta Xerîp û hevalên wî de ez şehîdê Kurdistanê bi tevayî bi bîr tînim.

MEHMET İMIŞÇI

## Ferhengok

<b>ast:</b> rade, sewiyê	<b>leylan:</b> serap
<b>banzdan:</b> mirina hespan	<b>lije:</b> heyet, kurul
<b>bermalk:</b> melkes, gêzî	<b>melkemot:</b> ezraîl,
<b>bone:</b> munasebet	<b>merc:</b> şert, hoy
<b>cemawer:</b> girse, (kitle)	<b>nakokî:</b> zidiyet, çelişki
<b>çewt:</b> şaş, xelet	<b>nediyarî:</b> belirsizlik
<b>dane navê:</b>	<b>nik:</b> cem. bal, hind,
jihedêxweborîn	<b>nîqaş:</b> gotûbêj,
<b>daniştok:</b> kursî	gengeşî (tartışma)
<b>darêzgerî:</b> yargî	<b>pêtal:</b> meşale
<b>destkarî:</b> mudaxele	<b>pêşdarazî:</b> pêşîn
<b>dîrust:</b> rast	hukûm, önyargî
<b>fitkirin:</b> li dijî hev	<b>porçê:</b> perûk
gijkirin, li hev sorkirin	<b>qaşo:</b> xwedêgiravî,
<b>fitnekarî:</b> lêsorkirin	goya (sözde)
(kışkırtıcılık)	<b>rêgez:</b> prensîp (ilke)
<b>gengaz:</b> pêkane,	<b>regez:</b> nîjad
mimkûn	<b>sebenestûn:</b> mirina
<b>giyan:</b> ruh	kûçikan
<b>gorbîhişt:</b> rahmetli	<b>sekiûn:</b> cihenimîn,
<b>handan:</b> teşwîqkirin-	mirina heywanan,
<b>handêr:</b> teşwîqkar	<b>siyer:</b> komika nivînan
<b>hemwelafî:</b> welaîf	<b>şîbak:</b> pace, pencere
(yurttaş)	<b>têvedan:</b> ajotin
<b>îbûn:</b> mirina keran	<b>xîzan:</b> belengaz, feqîr
<b>kêçe:</b> pirsgirêk, arîşe,	<b>xeternak:</b> bi talûke
mesele	<b>zanko:</b> Zanîngêh
<b>karîgerî:</b> bandor,	<b>zivêrbûn:</b> acizbûn
hîkarî	<b>zêmar:</b> starana şîne
<b>kîşkişandin:</b> zorlêkirin	(ağıt)
	<b>zîbare:</b> îmece



Li dijî Akın Birdal suîkast

# Gule di aştiyê de naçin

Bi taybetî êrişên dewleta tirk ên li ser hêzên welatparêz û şoreşger, piştî ku serlêdana wê ya ji bo endamtiya Yekitiya Ewrûpayê hate redkirin, bêhtir gur û tund bûn. Ji ber ku dewleta tirk berî vê yekê, ji bo ku bibê endamê vê yekitiyê, ne jidil be jî, xwe ji êrişên diyar dida alî. Lê piştî ku endamtiya Tirkiyeyê hate redkirin, rûyê rastîn yê Tirkiyeyê xwe da der.

Her wiha bi xurtbûn û berfirehbûna hêzên welatparêz û şoreşger, rengê van êrişan guherî û Tirkiyeyê bi awayekî sistematîk berê xwe da hêzên muxalîf. Bi merasîma rakirina cenazeyê gerilayê ARGK'ê Adnan Şeker, pîrozbahîya Roja Jinên Kedkar yê Cihanê, Newrozê û 1'ê Gulanê xurtbûna tevgera şoreşger baş diyar bû. Piştî vê pêvajoyê Tirkiye kete nav hewlên nû û ji bo ku têkoşîna Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê û hêzên şoreşger yê Tirkiyeyê têk bibe, giranî da şerê psikolojîk. Di vî warî de Şemdin Sakik gihîşt hawara wê. Rayedarê Tirkiyeyê li ser navê Sakik hin senaryo afirandin û berê xwe da hin saziyên sivîl û demokratîk. Di nav van saziyan de daxuyaniyên herî balkêş yê li ser Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal bû.

Li gorî îfadeyên ku wekî yê Şemdin Sakik hatin ragihandin, Akın Birdal piştigiriya Partiya Karkerên Kurdistanê

PKK'ê dikir û wekî milê rast ê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate binavkirin. Rojnameyên Tirkiyeyê yê birjuwa, bi awayekî berfireh li ser Akın Birdal rawestiyên û ew wekî hedef destnîşan kirin. Ev helwesta çapemeniya birjuwayê ji aliyê gelek derdoran ve wekî fitnekarî hate nixandin. Piştî vê pêvajoyê hêzên ku ji aliyê dewleta Tirkiyeyê ve tên bikaranîn, li Bolu û Stenbolê bi navê Kenan Mak û Bilal Vural du ciwanên welatparêz kuştin. Ev êriş roja 12'ê gulanê gihîştin asta xwe ya herî bilind; Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) li Enqereyê li navenda giştî ya İHD'ê ji aliyê du kesan ve hate gulebarankirin. Akın Birdal bi xedarî birindar bû û ew hildan bin tedawiya hûrbînî.

## Suîkast bi çalakiyên girseyî hate protestokirin

Suîkasta li dijî Serokê Giştî yê İHD'ê Akın Birdal di serî de Stenbolê, li gelek deverên Kurdistan û Tirkiyeyê bi çalakiyên girseyî hate protestokirin. Li metropolên wekî Stenbol, Enqere, İzmir, Edene û Mersînê, bi hezaran kes gihîştin hev û sloganên wekî: "Em hemû Akın Birdal'in!", "Bijî biratiya gelan!", "Artêş ji Kurdistanê bişeqite!", "Neçe leşkeriyê, xwîna birayê xwe nerijîne!", "Azadî bo neteweya kurd!" û "Ji bo azadî û aşî şer şer!" avêtin. Roja suîkastê li Stenbolê nêzîkî sê hezar kes li ber Şaxa Komeleya Mafên Mirovan ya Stenbolê gihîştin hev û heta Qada İstiklalê meşek li dar xistin. Li Meydana Taksîmê daxuyaniyek hate xwendin, di daxuyaniyê de dewleta Tirkiyeyê berpirsiyar hate dîtin û ev êriş wekî li dijî biratiya gelan û aştiyê hate nixandin. Dîsa hate gotin ku, di navbera salên 1989-94'an de 13 rêveber û endamên Komeleya Mafên Mirovan hatin kuştin.

Li aliyê din di heman rojê de, li Enqereyê jî meşek bi beşdariya nêzîkî hezar kesî ji aliyê şaxa İHD'ê ya Enqereyê ve hate lidarxistin. Dîsa roja 12'yê gulanê 1998'an li Stenbolê, girseya ku ji gelek sazî û rêxistinên demokratîk pêk dihat, ji ber İHD'ê heta ber Liseya Galatasaray, bi beşdariya 7 hezar kesî meşek hate sazkirin. Di daxuyaniya ku li ber Liseya Galatasarayê hate

xwendin de, li ser bêpirsiyarî û îhmal-kariya dewletê hate rawestandî û di heman demê de îstîfaya Wezîrê Karê Hundirîn, Miqûrê Ewlekariyê û Waliyê Enqereyê hate xwestin. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku, dema Tan-

bernameya Panel a MED-TV'yê bû û der barê suîkastê, daxuyaniyek da. Öcalan di daxuyaniya xwe de diyar kir ku, Akın Birdal şervanê rastiyê ye û êrişa li dijî Akın Birdal li dijî gelan e. Öcalan ev yek wekî tevkujiyekê bi nav



Akın Birdal bêhtir bi helwesta xwe ya li ser kêşeya kurd rika dewleta tirk kişand ser xwe. Bi taybetî di warê navneteweyî de de hemû civînan de pêwîstiya çareserkirina kêşeya kurd anî zimên. Vê yekê dewleta tirk di warê diplomatîk de xist tengasiyêke mezin. Lewra jî îtirafên ku li ser navê Şemdin Sakik derketin holê, ji xwe re kirin hincet û bingeha suîkasteke bi vî rengî amade kirin.

su Çiller Serokwezîr bûye navên ku ji aliyê wê ve hatine xwendin yek bi yek hatine kuştin. Piştî ku rojnameya Özgür Ülke tê bombekirin li hemberî Komeleya Mafên Mirovan jî kampanya hatiye destpêkirin. Li gorî daxuyaniyê, ev êriş ji aliyê hêzên organize yê ku di nav dewletê de ne hatiye kirin. Her wiha di dawîya daxuyaniyê de, axaftina Akın Birdal ya di damezerîna 11 saliya İHD'ê de hatiye dayin: "Yên ku dixwestin me bédeng bixin bila îro bizanibin ku, ew nikarin me bédeng bixin. Ji ber ku nikarin hêza yekîtiyê û rêxistîya gel bédeng bixin." Dîsa hate gotin ku, İHD rastiyan tîne zimên, ji dêvla şerê qirêjî İHD li vê cografyayê aştiyê dixwaze. Ji gelek sazî û partiyên siyasî jî daxuyani hatin kirin. Li layê din Navenda Giştî ya HADEP'ê jî daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de bal kişand ser fitnekariya çapemeniya tirk û ragihand ku çapemeniyê wekî HADEP'ê Akın Birdal jî mîna hedef destnîşan kiriye.

## A.Öcalan: Birdal şervanê rastiyê ye

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî bi riya telefonê beşdarî

kir û diyar kir ku, di vê pêvajoyê de pêwîstî bi 'Eniya Yekgirtî ya Gelan' heye. Bi baweriya Öcalan, dewleta Tirkiyeyê dît ku, Akın Birdal pêşengiya muxalefeta ku li Tirkiyeyê bilind dibe, dike, lewre ev êriş pêk anî.

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak jî, ji Girtîgeha Elmadağê mesajek da û ragihand ku, Tirkiyeyê tehamûlî xurtbûna muxalefeta civakî nekir û xwest ku parêzgerê mafên mirovan Akın Birdal ji holê rake. Her wiha wî got, divê ew nehêlin ku ev êriş bi ser bikevin.

Her wiha suîkast, ji aliyê gelek girtiyên siyasî ve jî hate şermazkirin. Li ser navê hemû dîlên PKK'yî Sabri Okm. Can Yüce- Muzaffer Ayata bi ser navê "Ber bi serhildanên nû ve" daxuyaniyek weşand. Ji girtiyên Girtîgeha Bursayê jî daxuyaniyek gihîştê destê Azadiya Welat. Daxuyani li ser navê girtiyên PKK, TİKB, MLKP, DHP, PRK-Rızgari, TDP, TDKP, EKİM, TKP/ML, THKP-C/HDÖ, THKP-C/MLSPB, TKP(ML) û TKEP'ê hatiye ragihandin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku wê hesabê vê êrişê bê pirsîn.

NAVENDA NÛÇEYAN



Gel yekser li dijî suîkastê reaksiyon nîşan da.



# Yekîtiya Sovyetê û kêşeya Kurdistanê

Şoreşa karkerên Rûsyayê hêviyê mezin da gelên bindest. Lê gelê kurd tu sûd ji vê şoreşê wernegirt. Pêşengê kurdên Başûr Mele Mistefa Barzanî piştî hilweşîna Komara Mehabadê çû Yekîtiya Sovyetê, lê destvala zivirî. Barzanî piştî ku hêviya xwe ji Yekîtiya Sovyetê birî, bû hevparê planên împeryalîstan.

**T**ê gotin ku Yekîtiya Sovyetê ji bo berjewendiyên xwe parçe feda kiriye. Ev siyaseta xelet bûye sedema xesirîna gelek hêzên sosyalîst ên welatên cur bi cur. Gelê kurd jî ji vê yekê gelekî zirar dît.

Komara tirk bi salên 1920'î re nû dihat avakirin. Ev hem ji bo Yekîtiya Sovyetê û hem jî ji bo dewletên împeryalîst rîskeke mezin bû. Lewre Lenîn ji bo ku sînorê Başûrê Yekîtiya Sovyetê biparêze û ji bo ku ev herêm nekeve bin bandora hêzên împeryalîst, alîkarî da M. Kemal. Di wê demê de mirov dikaribû wateyekê bide wê polîtîkaya Lenîn ya taktîkî. Lê piştê Stalîn ev polîtîka ji xwe re kir stratejî. Bi vê yekê jî ew ji prensîbên sosyalîzmê avarê bûye. Wekî encama vê polîtîkayê li ser kêşeya Kurdistanê perde hate kişandin, yanê kurd hatin fedakirin. Yanî pir gelan ji Şoreşa Kewçêrê sûd wergirt. Lê mixabin gelê Kurdistanê qet jê sûd wernegirt.



Mele Mistefa Barzanî

## Yekîtiya Sovyetê ji hevkarîya kurd û ermenan tirsîya

Bi taybetî helwesta Yekîtiya Sovyetê ya li hemberî Serhildana Agirî bi gîştî dîrî prensîbên sosyalîzmê bû. Mirov dibîne ku rejîma Sovyetê li dijî serhildanê xebat kiriye. Ango Yekîtiya Sovyetê li dijî gelê kurd alîkarîya dewleta tirk dike. Sedemên vê helwestê mirov dikare wiha rêz bike:

1-Di wê demê de hinek pirsgerêkên Yekîtiya Sovyetê li Qafqasyayê hebûn, lewre jî wê nexwest serê xwe bi tîşteki din re biêşîne.

2-Li gorî baweriya rayedarên Yekîtiya Sovyetê ger Kurdistanêk bihata

avakirin wê bi Ermenistanê re bibûya yek. Bi rastî jî hinek tîkiliyên Îhsan Nûrî Paşa bi Partiya Taşnaq re hebûn. Ji ber wan tîkiliyan Yekîtiya Sovyetê ji tevgera kurd tirsîya û jê dûr ket. Bi kurtasî tîkiliyên pêşengên Serhildana Agirî û Partiya Taşnaqê, Tirkîye û Yekîtiya Sovyetê nêzîkî hev kirin.

Li ser vê yekê kemalîstan Serhildana Agirî wekî "lîstika îngilîzan" bi nav kir û bi Yekîtiya Sovyetê re peymaneke veşarî girêdan.

Piştî vê peymanê dewleta tirk amadekariya xwe kir ku Tevgera Agiriyê di nav xwe de bixeniqîne. Li gorî vê peymanê veşarî, hêzên Yekîtiya Sovyetê ji aliyê Çemê Arasê ve, Çiyayê Agirî dan ber guleyan ji bo ku şervanên kurd nikaribin ji çembera Artêşa Tirk rizgar bibin. Heta hin caran dema leşkerên tirk ketine tengasiyê, ji Çemê Arasê leşkerên Sovyetê alîkarî dane leşkerên tirk.

Li gorî rapora îstixbarata îngilîzan, di girêdana peymanê guhartina sînorê Îran û Tirkîyeyê de jî dîsa destkariya Yekîtiya Sovyetê hebû. Jixwe piştî ku tirk Agiriyê Biçûk ji Îranê distînin û Agirî bi gîştî dorpeç dikin, tevgera kurd tîk dibin. Piştê jî dibêjin dê rûs we bikujin, gel koçber dikin. Ev koçberî di zivistanê de pêk tê, lewre jî mîna qirkirinekê derbas dibe.

## Alîkarîya ji bo Komara Mehabadê ne ji dil bû

Dîsa alîkarîya Yekîtiya Sovyetê ji bo Komara Mehabadê heye, lê ew alîkarî jî ne ji dil e.

Bi qedîna Şerê Duyemîn ê Cîhanê re, valahiyek desthilatdariyê li Îranê pêk tê. Yekîtiya Sovyetê wê valahiyê ji bo xwe bi xetere dibîne, lewre alîkarîya komara kurd dike. Lewre jî di sala 1946'an de Serokwezîrê Îranê bi Serokwezîrê Yekîtiya Sovyetê Cakof re peymanekê girê dide, Cakof bi hêsani dipejirîne ku ji Mehabadê Azerbaycanê hêzên xwe vekişîne. Piştî ku hêzên Yekîtiya Sovyetê ji herêmên navborî vedikişin, Komara Mehabadê hildiweşe.

Ji van her du mînakên ev encam derdikevin:

1-Yekîtiya Sovyetê kurd ji bo parastina sînorên xwe dane xebitandin. Alîkarî ne ji bo azadiya gelê kurd, lê ji bo parastina berjewendiyên e.

2-Yekîtiya Sovyetê li ser xwîna kurdan û hebûna wan tîkiliyên xwe bi Îran û Tirkîyeyê re meşandine. Helbet Yekîtiya Sovyetê bi vê polîtîkaya xwe ya berjewendîperest bûye sedem ku tevgera kurd ji sosyalîzmê dûr bikeve, hin caran jî bibe destîkê împeryalîstan.

3-Rayedarên yekemîn dewleta sosyalîst hebûn û azadiya kurdan ne-parastîye. Ev dîrketina ji rêgezên sosyalîzmê ye. Heke Yekîtiya Sovyetê alîkarîya tevgera kurd bikira, kemalîstan nedikaribûn tîkiliyên xwe yê bi Yekîtiya Sovyetê re wekî çekeke şantajê li dijî împeryalîstan bi kar bînin, wisa jî xwe bi wan şîrîntir bikin.

Mîna keke din ji helwesta vê dewletê ya li dijî Mela Mistefa Barzanî ye. Wekî tê zanîn piştî pelîşîna Komara Mehabadê, Mela Mistefa Barzanî çû Yekîtiya Sovyetê, bi salan li wir ma.

## Mele Mistefa Barzanî û Yekîtiya Sovyetê

Barzanî piştî ku li ber deriyê Qesra Kremîlînê dest bi livbaziya rûniştinê kir, berrîsên qesrê bi wî re peyivîn. Di sala 1960'î de Xrûşov soza alîkarîyê dide wî. Lê ew dixwaze bi vî awayî Mîralay Abdulkerîm Qasim bi Yekîtiya Sovyetê ve girê bide. Lewre Yekîtiya Sovyetê dixwaze ji nefta Iraqê sûde wergire. Her çiqas Serokê Yekîtiya Sovyetê Aleksî Kosîgîn li dijî qirkirinê ye, ji ber vê yekê di 11'ê adara 1970'yî de bi handana Yekîtiya Sovyetê peyman otonomiyê tê girêdan jî, dîsa jî Sedam Huseyin herî giran bi alîkarîya Yekîtiya Sovyetê anî ser hêzên Barzanî.

Di sala 1972'yan de di navbera Yekîtiya Sovyetê û Iraqê de peymanê dostanî û hevkarîyê hate girêdan. Yekîtiya Sovyetê li Rojhilata Navîn mewziyekê bi dest dixwe, lê wê mewziyê li dijî kurdan bi kar tîne. Çimkî Yekîtiya Sovyetê li aliyekî serbaz û pilotên Iraqê perwerde dike, ji wê dewletê re çekan dişîne, li aliyê din jî alîkarîya Barzanî dike. Barzanî wê rewşê dibîne, lewre jî bi hêsani dikeve dafika DYA, Îngilîz û Îsraîlê. Hêzên împeryalîst tevgera kurd bi aliyê xwe de dikişînin û li dijî Yekîtiya Sovyetê bi kar tînin.

Jixwe piştî salên 1960'î rayedarên Yekîtiya Sovyetê biryarê digirin ku ji binî ve dev ji alîkarîya tevgerên nete-



Rêberê Şoreşa Kewçêrê Vîladîmîr Îlyîç Lenîn digel karkerên Sovyetê

weyî berdî û tevî sîstema împeryalîst, bi awayekî aştîyane bijîn.

Dema mirov bala xwe bide helwesta partiyên komunist ên klasîk ya li hemberî Tevgera Azadiyê, tê dîtin ku nêzîktêdayîna wan ne li ser bîngeheke rast e. Hemû partiyên girêdayî rejîma Sovyetê li dijî Tevgera Azadiyê bûn, ev yek jî nîşan dide ku li ser daxwaza Yekîtiya Sovyetê, wan partiyên xwe ji Tevgera Azadiyê dûr xistine. Lê Tevgera Azadiyê xwe ji bandora neynî ya sosyalîzma reel parast û piştî hilweşîna sîstema sosyalîzma reel jî xebata xwe geştir kir.

Di encamê de mirov dikare van tiştan bibêje:

1-Yekîtiya Sovyetê belkî mîna dewletên împeryalîst alîkarî nedaye dewletên ku Kurdistan dagir kirine, lê dîsa jî bûye sedema qirbûn û koçberbûna kurdan.

2-Siyaseta Yekîtiya Sovyetê li ber nîqaşkirina kêşeya Kurdistanê mîna kelemekî bû, rê nedida ku kêşeya kurd li qadên navneteweyî bê rojevê û gengeşî li ser wê pêk werin.

3-Siyaseta Yekîtiya Sovyetê bûye sedem ku bîrdoya sosyalîzmê bi çewtî (bi destê rêxistinên tirk) bikeve nav Kurdistanê. Lewre jî gelê kurd bi çavêkî pir xerab li sosyalîzmê dinihêrt. Helbet di wê nihêrtinê de bandora propagandaya neynî ya împeryalîst û dagirkeran jî hebû, lê bîngeh polîtîkayên şaş ên ku li jor hatin ravekirin bû.

AHMET HUSEYIN



# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 11 -

## Cînavkên pêrebestî

Ev cure cînavk wekî parkîti bi dawîya lêkeran ve dibin. Celadet Bedirxan, wan wekî lêkera bûn bi nav dike, Fergîn Melik, navê cînavkên paşgînkirî li wan kiriye. Hindek kes jî navê parkîti kes li wan dikin. Murad Ciwan ew navê ku em bi kar tînin, li wan cure cînavkan kiriye û ew di nav cînavkên kesane de hesibandine. Her wekî berê jî hatibû gotin, di peyivîna de sê alî hene; yê/ya ku dipeyive, yê/ya ku pê re tê peyivîn û yê/ya ku qala wî dibe. Gava her sê aliyên pirjimar (yên ku dipeyivin, yên ku bi wan re tê peyivîn û yên ku qala wan têkirin) jî li wanên yekjimar zêde bibin, wê gavê şes kes derdikevin holê. Ev cur cînavk, li pey cînavkên kesane yê xwerû (ez, tu, ew, em, hûn, ew) tînin. Cînavkên pêrebestî bi lêkeran ve dibin, lê ji navdêr, rengdêran cuda tînin nivîsandin.

Bo nimûne:

Ez im/ Tu yi/ Ew e/ Em in/  
Hûn in/Ew in

Cînavkên pêrebestî, dema bi navdêran an jî rengdêran re tînin bikaranîn, du dirûvên ji hev cuda digirin; heke navdêr/ rengdêrên ku berî wan tînin, bi dengdarê biqedin vî dirûvî digirin:

Ez mirov im/ Tu mirov î

Ew mirov e/ Em mirov in  
Hûn mirov in/ Ew mirov in  
Dema navdêr/ rengdêr bi dengdêre biqede, wê demê teşeyê wan cînavkan jî diguhere. Wekî mînak dema ew li pey rengdêra "bajarî" bînin, dirûvê wan wiha dibe.

Ez bajarî me/ Tu bajarî yi  
Ew bajarî ye/ Em bajarî ne  
Hûn bajarî ne/ Ew bajarî ne  
Piştî lêkeran dirûvê cînavkên pêrebestî wiha ye.

Ez diçim/ ez dixwim  
Tu diçî/ tu dixwî  
Ew diçe/ ew dixwe  
Em diçin/ em dixwin  
Hûn diçin/ hûn dixwin  
Ew diçin/ ew dixwin

Li vir xaleke girîng ku divê li ser bê rawestandîna heyê. Her wekî berê jî hatibû daxuyandin, cînavk jî li gori pey-wira ku digire ser xwe, diguhere. Li hin cihan cînavkên xwerû kirde ne, li hin cihan jî bireser in. Cînavkên pêrebestî her tim li gori cînavkên xwerû tînin bikaranîn, heke kirde cînavkên xwerû be, lêker li gori kirde cînavkên pêrebestî digire, heke bireser be, îcar cînavkên pêrebestî li bireser dinihêrin.

Wekî mînak:

Ez nê dixwim.

Tu nê dixwî  
Ew nê dixwe.  
Em nê dixwin.  
Hûn nê dixwin.  
Ew nê dixwin.

Di mînakên li jor de cînavkên xwerû kirde ne, bireser navdêrek e. Lê dema ew kom cînavk bibe bireser, îcar cînavkên pêrebestî bi bireseran re dibin lihevkiyê.

Bo nimûne:  
Te ez kuştim.  
Min tu kuştî.  
Wî ew kuşt(e)  
Te em kuştin.  
Min hûn kuştin.  
Wê ew kuştin.

## Çewtiyeke belavbûyî

Di vî mijarê de, divê mirov balê bi-kişîne ser çewtiyeke, li nav kurdan belav bûyî ye. Li hinek herêmên Kurdistanê rêpîvana (qaîde) tewangê tîk çûye. Ji ber vî yekê ew rêpîvana ku li jor hate ravekirin jî li ber çavan nayê girtin. Di demên borî de ku kirde tewandî û bireser xwerû ye, li wan herêman hem kirde, hem jî bireser tê tewandin. Ew jî dibe sedema gelek alozî û tevliheviyan. Bo nimûne li cihê ku bibêjin; "Zelalê Zîn dît" dibêjin "Zelalê Zînê dît." Li vî

derê kirde û bireser tevlihev bûne, mirovekî/e ku bi vî rewşê nizanibe, nikare tê derxe, ka kê ditiye û kê jî hatiye ditiyan ango kê kê ditiye. Lewre li gori rêzimanê kurdî ew her du jî kirde ne. Kurdên ku li wan herêman dijîn, dema cînavka dixin cihê wan navdêran jî wiha dibêjin; "Wê wê dît". Ji bo zelalkirina mijarê mirov dikare, mînak "Min wî dît." û "Wî min dît" hilde dest. Her wekî diyar e, di her du mînakên de jî cînavkên xwerû wînda bûne. Lê cînavka pêrebestî ji bo her du hevokan jî yek e. Cînavka pêrebestî ya kesê seyemîn (min ew dît) e. Ew form ji bo pirjimar jî tê bikaranîn. Yanê "Me wan dît" û "Wan me dît" tê gotin.

Çewtiyên di bikaranîna cînavkên pêrebestî, bi vî yekê ne sînorkirî ne. Li hin herêman lêkerên kesên seyemîn wekî kesê duyemîn tînin kuştin. Yanê li cihê ku bibêjin: "Ew diçe", dibêjin "Ew diçî". Heke mirov bi awayekî din bibêje; li nik kesê seyemîn "ew" cînavka pêrebestî yê kesê duyemîn /-î/ tê bikaranîn. Her wiha li hin herêman jî be-revajî vî yekê, digel cînavkê kesane yê kesê duyemîn cînavka "tu", cînavka pêrebestî ya kesê seyemîn /-e/ tê bikaranîn. Yanê "Tu dibîne, tu diçe", tê gotin ew jî xelet e. Ew xeletiyên bi vî rengî divê bi tu awayî wekî tiştêkî rewa nayê pejirandin, lewre ew rêpîvanên zimên tînin dibin û dibin sedema tevliheviyên mezin.

## Bakurê Îrlanda û Kurdistan

NEJDET BULDAN



Girava Îrlandayê axeke gelek mezin nî e. Lê belê piranî ji ber pirsgerêka Bakurê Îrlandayê her dem di rojevê de ye.

Ez yekemîn car li sala 1995'an çûme Îrlandayê. Li ser navê PKDW'ê me gelek hevdtîtin çêkirin û tîkilî pêk înan. Bernameya me tîr û tîjî bû. Me hevdtîtin bi Serokê Belediyeya Dublinê û endamên meclîsa wê, gelek parlamentê û serokên rêxistinên sivil re çêkirin. Wezîrê Karûbarên Derve yî û nûnerên Sinn Fein yê Dublinê re me rûniştinên girîng pêk înan. Paşê me konferansê li ser Kurdistanê çêkir. Gelek mirovên zanyar, siyatmedarên Îrlandayî û rojnamevan beşdarî vî civînê bûbûn. Hevpeyvînek dirêj bi rojnameya Irish Times, ku mezintirîn rojnameya vî welatî bû, re hate çêkirin û ew hevpeyvîn jî hatibû weşandin.

Paşê em bi fermî çûne Bakurê Îrlandayê ku di bin dageriya Bîrtanyayê daye. Bajarê ku navê wî Derry'ê bi pêşewaziyek germ em hatine mîvankirin. Gelek endamên Sinn Fein bi me re civîn çêkirin. Û bi taybetî Serokê Sinn

Fein yê duyemîn birêz Martin Macginnnes re me hevditeneke fermî û dirêj çêkir.

Di ser van tîkilî û naskirinên gelê Îrlanda û Kurdistanê re, çend rojan pêşiya niha jî em bûne mêvanên kongra Sinn Feinê. Li paytextê Îrlanda Dublinê. Lê belê ev car guhartinek hebû di rewşa Bakurê Îrlandayê de. Çend roj berê vî kongreyê peymanekê aşiyê di navbera Sinn Feinê û dewleta Bîrtanya de hatibû îmkirin. Yanî di şerekî dirêj, şoreşeke azadiyê de pêvajoyeke nû dest pê kiribû.

Ez naxwazim dîr û dirêj li ser şertên vî peymanê û pêvajoya nû bisekinim. Lê pêwîst e ku biryara kongirê ya ku bi ços û şahî hatiye wergirtin bi bir bînim: "Sinn Fein, piştigiriya azadî û serxwebûna gelê kurd diket. Bê qeyd û şert."

Di hevdtîna me ya piştî kongreyê ya bi Martin Macginnnes re, gotinên wî yê dawî ev bûn: "Em wekî gelê Îrlanda, em wekî berpirsyarekî Sinn Feinê dizanin ku, du pirs-girêkên mezin hene, li cihanê. Yek ya kurdan e, yek jî ya Îrlanda ye. Em gihîştine pêvajoyeke nû. Berê aşî, du re azadî. Ev jî bo me kêfxweşî û serfiraziyê mezin e. Di vî pêvajoyê de em jî di zanin ku kelem û âstengên pêşiya me paqij nebûne. Ez hêvîdar im, rojek nêzik de Kurdistan jî dê rizgar bibitin. Lew ku hûn jî şoreşeke pîroz û paqij dimeşînin. Û mercin we jî gelek dijwar in. Bi hêvî û daxwaziyên xurt, silav û hurmetên germ ji bo gelê Kurdistanê..."

Belê piştî 30 salan agirbest û peymanekê aşiyê. Hejmara nifûsa Îrlandayê mîlyon û nîvek e. Heya niha di şer de ji her dû aliyên du

hezar kes hatine kuştin. Nêzikî 800 endamên ÎRA û Sinn Feinê girtine. ÎRA hêza çekdar ya Bakurê Îrlandayê ye. Sinn Fein jî bi eşkere siyasetê dimeşînin. Lê êrişên girtine û kuştine herdem li ser Sinn Feinê jî hatine çêkirin. Di hilbijartinên herêmi de Sinn Feinê herdem endamên belediyên yê Bakur kar kirine. Sala borî (1997) hilbijartina giştî hate çêkirin û du endamên Sinn Feinê wekî nûner hatine hilbijartin ji bo meclîsa Bîrtanyayê. Serokê Sinn Feinê Gerry Adams û cîgirê wî Martin Macginnnes. Li gorî zagona bingehîn ya Bîrtanyayê ji bo endamtiya parlamentoyê, pêwîst e ku endam sond bixwin. Ku girêdayîbûna xwe ji bo Banû (qralîçe) eşkera biken. Lê belê herdu endamên Sinn Feinê sond nexwarin û ew hilnegirtine Parlamentoya Bîrtanyayê. Peymana aşiyê jî bi destê herdu nûneran hate îmkirin. Tiştê herî balkêş ew bû ku, ketina herdu nûneran ya parlamentoya qedexe ye. Û herdu nûneran û hevalên wan, peyman di Qesra Serokwezirtiya Bîrtanyayê de îmze kirin. Li gorî şertekê vî peymanê, di meha gulanê de, ev peymanê dê di nava gelê de bête dîngandin (referandûm).

Gelo Bîrtanya gelek jî dewleta tirk biçûktir an jî kêmastir e? An jî hejmara nifûsa Îrlanda Bakur zêdetir e jî hejmara kurdan? Pirsgerêka Îrlanda bi herêmi jî Pirsgerêka Kurdistanê asê û dijwartir e? Ji me bêhtir xwîn hatiye rijtin? Ji me bêhtir bindest û kolê mane? Na. Na. Na. Cudahî ji tîgihîştin û kultura aşiyê tê. Di cihanê de çu dagirkerên baş nînin in. Lê belê îngilîz jî tirkan zanatir in. Siyaseta wan xurtir e.



# 1'ê Gulanê û Meha Şehîdan

Refên gerîla di çiyayên Tirkîyeyê de jî, xwe bi giyana Deniz, Yusuf, Hüseyin, İbrahim, Haki û Kemal dipêçin, rêxistina tolhildana mezin diafirînin û bi pêş ve dibin. Di nav refên gerîla de û qadên serhildana Newroz û 1'ê Gulanê de, gelê kurd û tirk mil didin hev, bingeha yekîtiyê, wekhevî û biratiya gelan xurt dikin.

**M**eha gulanê, ji bo şoreşa gelê kurd û tirk jî meheke pir girîng û watedar e. Her roja wê tijî şehîd e, tijî berwedan û xwîn e. Her şehîd, dibe xelekek û tev li zincîra biratiya gelan dibe. Xwîna her şehîdî/ê, dibe xerc ji bo avakirina gerdûneke nû, azad û kamûran. Di meha gulanê de, şehadeta pêşengên şoreşa Tirkîyeyê Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan, Hüseyin İnan û İbrahim Kaypakkaya pêk hatiye. Bi şehîdkirina van şoreşgerên hêja, dijminê faşîst û mêtînger xwest ku, şoreşa Tirkîyeyê bêserî bihêlin. Xwest ku pêtala sosyalîzmê ji Enqera dernekeve û vê pêtalê di Enqereyê de bitefine. Tirsê dijmin a herî mezin ew bû ku ronahiya sosyalîzmê tariya Kurdistanê belav bike û tovên berxwedanê di şa têkeve ser û dilê kurdan.

## Derketina Tolhildêr û şehîdên yekemîn

Lê belê carekê pêtal bi xwîna şehîdan pêketibû. Pêwîst bû, pêtala şoreşê netefe û xwîna şehîdan li erdê nemîne. Bi kurtasî Tolhildêrek pêwîst bû.

Belê, ev Tolhildêr, Serokê Neteweyî bû. Serokê Tolhildêr rabû, rahişte pêtala sosyalîzmê û da ser rîya xwe; kete rîya Kurdistanê û dest bi danîna xeta şoreşê kir. Ewîl tarîstana mêtîngerîyê ji serê ciwanên xwendekar belav kir, dilê wan paqij kir, tovê rizgariyê û şoreşgerîyê lê reşand û di dilan de agirê ewîna welêt pêxist.

Lê dijmin sond xwaribû, biryar dabû, da ku şitla neteweya kurd û ramana rizgariyê li Kurdistan şîn nebe. Dixwest hîna di piçûkayî wan de şitlan bipêrçiqîne. Lewma sixurên xwe yekser şandin ser kar. Bi destê tevgera sixur û provokator "Stêrka Sor" dest bi şehîdkirina rêber û serekên Tevgera Azadiyê kir. Di 18'ê gulana 1977'an de Haki Karer û piştî şehadeta Haki bi salekê, 17'ê gulanê Halil Çavgun, bi destê xayîn û nokeran li Hîlwanê hate şehîdkirin. Dijmin bi zanabûn şoreşgerên serek û pêşeng di bijartin. Di şa wekî Dehaqê xwînwar qesta mejiyê gelê kurd kiribû. Dixwest wî bêserî bihêle. Lewre, jê re kurdê bêserî pêwîst bû. Dijmin ewil berê xwe dabû milê têkoşînê yê navneteweyî. Dixwest ku Kurdîtiyê bi tenê bihêle û bi rihetî bipêrçiqîne. Lewma, şehadeta Haki Karer pir girîng bû. Ji ber ku ev şehadet an wê bibûya sedema tirs û revê an jî wê bibûya sedema tolhildan û mezinkirina têkoşînê.

Serokê Tolhildêr, ev şehadet kir meseleyeke pir mezin û dest bicihanîna tolhildanê kir, tolhildan bi rê xist. Tolhildan, damezirandina partiye û mezinkirina têkoşînê bû. Pêwîst bû qetilê Haki jî bihata cezakirin. Ev her du jî di demeke kurt de hatin kirin. Lewre bêpartî têkoşî-



nê nikaribû xwe ji dijmin biparêze, geş bike û nikaribû ber bi serkeftinê bimeşe. Ragihandina biryara damezirandina Partiyê, xofeke hîn mezintir xiste dilê mêtîngerîyê û nokerên wê. Lewre, sixur û nokeran kar nekiribû; têkoşîn bi lezê mezin xurt û geş dibû. Li Kurdistanê roj bi roj çeper li mêtîngerî, xiyaret û nokerîyê teng dibû. Li dijî vê pêşveçûnê, mêtîngeran dest bi qirkirinan, rêberîya awarte (sıkıyönetim), kuştin û girtinan kirin. Girtîgeh bi welatparêz, alîkar û endamên têkoşîna azadiyê mişt tijî bûn. Lê belê van tevan jî têrî rawestandina têkoşînê nekir. Dawiyê artêşa dijmin derbe li dar xist û cuntaya faşîst hate ser kar. Cuntayê li dijî gelê kurd û girtiyan wahseteke mezin da meşandin. Di encama vê zilmê de, nêzikî 50-60 kes hatin şehîdkirin, du caran ji wan zêdetir jî seqet û nexweş man. Girtiyan şoreşger û welatparêz bi gernasî li ber xwe dan. Yek ji van berxwedanên gernasî jî, xweşewitandina Çaran e: Ferhat Kurtay, Necmi Öner, Mahmud Zengin û Eşref Anyık. Çaran ji bo ku wahseta dijmin û îfrafkariyê, xwespartin û xiyaretê bidin sekinandin, neft bi ser xwe dekirin, ketin milên hev û xwe şewitandin. Wan xwe kirin pêtal û tarîstana girtîgehê belav kirin. Çaran agirê Mazlum, agirê Newrozê di Gulanê de jî pêxist; agirê neteweyî û yê navneteweyî xistin serhev û geştir kirin. Gulan bi xwîna wan hîn sortir bû.

Di wan rojên dijwar de, li derve, li serê çiyayên amadehiya şerê çekdarî dihat kirin. Mehmet Karasungur û İbrahim

Bilgin, ji bo pêkanîna yekîtiya neteweyî, li hevhatina PDK û YNK'ê jî bo amadehiyên şerê çekdarî li başûrê welêt xebitîn. Rojê wê carê 2'ê gulanê 1983'yan bû; hêzên ku lihevhatina kurdan û amadehiyên şoreşa Kurdistan nedixwestin, ev her du şoreşgerên hêja şehîd kirin. Gulan bi carekê din, bi xwîna şehîdên welêt sor bûbû. Vê xwînê, bingeha şerê çekdarî danibû û tovê yekîtiyê av dabû. İro li ser vê bingehê artêşên serkeftinan, amadehiyên Kongreya Neteweyî û serkeftinên şoreşa Kurdistanê bilind dibin.

## Tirêja sosyalîzmê li Kurdistanê hilatiye

İro giyana şehîdên Şikago û giyana hemû şehîdên şoreşa cihanê, di şoreşa Kurdistanê de şad dibe. Lewre, şoreşa Kurdistanê ne tenê şoreşeke neteweyî ye; ew, li ser bingeha dîroka berxwedana hemû çîn û gelên karker bilind bûye. Her wiha, ew bi qasî ku neteweyî ye ew qas jî şoreşeke navneteweyî ye. Hêvî û miradên gel û çînen bindest yê rizgariyê di şoreşa Kurdistanê de bi cih tî.

Bi vî rengî navneteweyî wate û girîngiya şoreşa Welatê Rojê pir mezintir dibe. Lewre, li dijî mirovatiyê sîc û gunehê ewil, kedxwarî û zordestiya ewil, di xaka Mezopotamyayê de, di xaka Welatê Rojê de derketiye holê. Vê kedxwarî û zordestiyê li dijî mirovatiyê, ev nêzikî deh hezar sal e, gelek sîc û gunehên mezin kirine. İro di şexsê şoreşa Kurdistanê de, mirovatiyê di şa di xaka Mezopotamyayê de, li Welatê Rojê, ji kedxwarî û zordestiyê hesab dipirse. Cihê ku kedxwarî û zilmkarî jê derketiye, wê di

wir de têk dibe, tola deh hezar salan, tola hemû şehîdan azadiyê jê dipirse. Ku azadiya xwe li ku derê winda kiriye, di şa li wir lê digere û di oxira wê de di şa xwîna xwe dirijîne. Lewma li Kurdistanê wate û şerefa şoreşgerîyê pir mezin e. Tirêjen roja sosyalîzmê wê carê ne ji metropolên împaryalist, ne ji Paris an Moskovayê dibiriqin; ji welatekî bindest, ji eniya gelekî bindest û karker, ku kedxwaran her tişt jê re qedexe kiriye, li welatekî ku zilma kedxwaran û mêtîngeran tê de har bûye û nirxên mirovatiyê ketine bin piyan û hatine lewitandin, îro roja sosyalîzma zanîst hilatiye. Gelê kurd ji bo serkeftina wê şoreşa mirovatiyê, îro wekî lehiyê xwîna xwe diherikîne û destanên gernasiyê dinivîse.

Belê, gelê kurd, di salvegera 1'ê Gulaneke nû de, di şexsê xwe de, mirovatiyê ji gemara împeryalizm, mêtîngerî, kevneperestî, zordestî û hemû rengên kedxwariya bi xwîn û dilsoj dişo. Di şa na wê de azadiyê, serxwebûn û wekhevîyê, biratiyê û rêhevaliyê ava dike. Haki Karer digot: "Şoreşa Tirkîyeyê, di serkeftina şoreşa Kurdistanê re derbas dibe." İro ev hêvî, bawerî û mirada şehîdan bi cih tî. Refên gerîla di çiyayên Tirkîyeyê de jî, xwe bi giyana Deniz, Yusuf, Hüseyin, İbrahim, Haki û Kemal dipêçin, rêxistina tolhildana mezin diafirînin û bi pêş ve dibin. Di nav refên gerîla de û qadên serhildana Newroz û 1'ê Gulanê de, gelê kurd û tirk mil didin hev, bingeha yekîtiyê, wekhevî û biratiyê gelan xurt dikin.



□ 16 gulan 1926 :

**Serhildana Çiyayê Agiriyê rû da**

Yekem car hêzên kurd û dewleta tirk li Çiyayê Agiriyê şerê hev kirin. Di sala 1926'an de Bro Têlî Heskî li Araratê serî li ber dewleta tirk rakir. Di 10'ê gulana 1927'an de li derveyî welêt rêxistina Xoybûnê hat damezrandin. Di bin serokatiya Bro Têlî Heskî de Hikumeta Agirî hate damezrandin. Ihsan Nurfî Paşa bû fermandarê leşkerî. Hikumeta Agirî heta sala 1931'ê li ber xwe da. Hêzên kurd xwe nedan dest, çeper şikandin û derbasî rojhilatê Kurdistanê bûn. Bi vî awayî serhildan têk çû.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 20 adar 1930:

**Hereketa Stewrê**

Di destpêka sala 1930'î de bi beşdariya waliyên bajarên Kurdistanê û Mufetîşê Herêmê İbrahim Tealî civînek tê çêkirin. Armanca wê civîne rê li ber serhildanên kurdan girtin û çekên di destê gel de berhevkirin, bû. Li ser vê biryarê, artêşa tirk dest bi şer kir. Çekên gundiyan ji wan girtin û kesên li hember derketin jî kuştin. Serhildana Stewrê jî bi vî awayî dest pê kir.

Dayikên şehîdan roja dayikan pîroz kirin:

# 'Şehîdên me dibin tov'



Li şaxa NÇM'ê ya Stenbolê, 9'ê gulana bi boneya Roja Dayikan bernamêyek hate lidarxistin. Di bernamêyê de pêşîn, li ser navê Yekîtiya Malbatên Mezopotamya Şerîl Ertik axaftinek kir. Wê, da xuya kirin ku, şehadetê rê li ber azadiya jinan vekirîye. Her wiha Dayika Döndü, ku yek ji dayikên şehîdan e, got ku ew dê heta hetayê li ber xwe bidin û wiha peyivî: "Her law û keçên me, ku şehîd dikevin, dibin tov."

Piştî van axaftinan, sê dayikên ku wekî rûmeta sala 1998'an hatibûn hilbijartin, xelatên xwe wergirtin. Pêşîn xwişka Mazlum Doğan û Delîl Doğan Serap Mutlu, ji ber ku dayika wan Kebire Doğan nexweş bû, li ser navê wê plaketa xwe ji destê rêvebera Navenda Şaxa HA-DEP'ê ya Stenbolê Aysel Karadağ wergirt. Serap Mutlu, di nav dirûşmeyên beşdaran de wiha axivî: "Mazlûm û Delîl birayên hemû Kurdistanîyan in"

Paşê dayika şehîd Turgut Yıldız (Pîro) Münire Yıldız, plaketa xwe ji destê Seroka Komeleya Jinên Azad Mürüvet Yılmaz wergirt. Yıldız qala termên gerîlayên ku li Antalyayê ji goran hatibûn derxistin kir û wiha got: "Ma ev kirin çiqas insanî ye. Dewlet lawên me berî hev dide. Yek dibe leşker yê din dibe gerîla. Êdî em cenazeyan naxwazin."

Piştî re dayika şehîd Aziz Turhallı û Ayfer Turhallı, Asiye Turhallı plaketa xwe ji destê Fazilet Buldan, ku ji Yekîtiya Malbatên Mezopotamya ye wergirt. Asiye Turhallı hestên xwe wiha anîn zimên: "Keçika min Ayfer, li Şirwanê şehîd ket lê tim rîya me girtin ku em

negihêjin cenazeyê wê. Kurê min wê diplome bîstanda û bibûya doxtor, lê li dewsa karta diplomayê, nameya cenazeya wî hat. Me sê mehan hewl da ku em cenazeyê wî bistînin." Bernamê bi xwendina helbestan û konsera Koma Azad qediya.

**Dayik çî dixwazin**

Her wiha rojek berî wê çalakiyê, li MED-KOM'ê ji aliyê Komeleya Jinên Azad ve, bi navê "Di Roja Dayikan de dayik çî dixwazin" forûmek hate lidarxistin. Forûma ku ji aliyê Parêzer Aysel Tuluk ve dihate pêşkêşkirin, wekî mêvan dayikên şehîdan, wekî axifger jî dayikên kesên winda, gerîla û leşkerên kurd, ku di şer de hatibûn kuştin, amade bûn.

Di beşa yekem de Aysel Tuluk, qala pêvajoya ku jin tê re gerbas dibin, kir û li ser jiyana bêrêxistinî ku layiqê jina tê dîtin, rawestiya. Piştî jî bi rêzê dayika leşkerê Rahime Ere, dayika gerîlayekî Firdews Çelîk, dîsa dayika gerîlayekî Atiye Öztürk û dayika rojnameger Ferhat Tepe Zübeyde Tepe axivîn. Her du dayikên leşkeran jî, di axaftina xwe de diyar kirin ku, zarokên wan bi zorê birine leşkeriyê, li leşkeriyê gelek pest û kotekî li wan hatiye kirin û peyre jî hatine kuştin. Piştî wê jî wan re gotine "Kurê we xwe kuştîye."

Di beşa duyem de, Leman Yıldırım, endama İHD'yê Ümit Efe, Berpirsiyara Komeleya Jinên Azad Mürüvet Yılmaz hest û ramanên xwe anîn zimên. Di dawiya forûmê de, hemû dayik bi çepikan hatin birêkirin.

A. WELAT/STENBOL

**ÇAVDÊRÎ**

"êdî gelê kurd bi dil û mêjiyê xwe şer dike"



SERKAN BRÛSK

Bi qasî ez dizanim û min bihistiye, ev yekemî car e ku, çekdarên gelê Kurdistanê li ser xaka dijmin ji bo berjewendên xwe yê millî û civakî şer dikin û şehîd dikevin. Dewlet ji bo ku pêşiya vê pêşketinê bigire, hêzên xwe yê sivil û leşkerî xistiye hereketê. Dewleta dagirker, bi hêzeke pir mezin, ji ya ku pê Qibris dagirkiribû mezintir, bi hemû teknîka nûjen şerê Şervanên Azadiyê dike. Yanî artêşa gelê me, li dijî yek ji mezintirîn û hovtirîn artêşa cihanê, li ber xwe dide û serkêşiya azadkirina gelê me dike. Heta niha di vê têkoşina dijwar de qehremantî û lehengiya şervanên me, li hemû cihanê deng daye û dide. Dost û dijminên me yê diyar û nediyar vê yekê qebûl dikin. Wekî ku dewleta Tirk bi xwe jî radigihîne 24 general bi çil hezar leşkerî, çend rojnemavan û çend hezar çarşikan vî şerî didin meşandin. Kin û kurt çî ji destê wan tê teqîr nakin. Lê wisa dixuye ku hêzên me, bi baweriyê pir mezin li ber xwe didin û rîya rêbirina azadiya me bi destê wan ve bemaadin. Bi gotina wan "Êdî gelê Kurd nema tenê bi dilê xwe şer dike her wiha bi dil û mêjiyê xwe vî karî bi xurtî dimeşîne." Nifşê me, di vê temenbiçûkiya xwe de, bûye şahidê gelek pêşketinên mezin.

Tê bîra min, dema kekên me yê siyasî, di nav peyvên xwe yê xerîb û eceb re carina behsa azadiya Kurd û Kurdistanê dikirin, xelkê tiştê ji gotinên wan fêhm nedikir. Xelkê her behsa şikênandina Şêx Seîd, xebata bê-encam ya Barzanî û xurtiya dewletên dagirker dikir. Heta piraniya gelê me navê kurd û Kurdistanê ji bîra kiribû. Bifikirin gelo çî ji vê zehmettir heye ku miletek navê xwe ji bîra bike? Ya rastir pê dabîn jibîrakin. Niha ku ez bibêjim mirovekî/ê navê xwe ji bîra kiriye, hûn dê eceb mayî bimînin. Hun dê bibêjin miheqeq ya ew gêj e yan jî dîn e. Rast e, mirovek bi hêsanî navê xwe jî bîra nake. Kesek ne navê xwe û ne jî navê xwe yê neteweyî ji bîra dike. Lewre yê navê xwe ji bîra dikin, bextê xwe yê jiyandî ji winda dikin. Pê re bextê wan kor dibe û kûçê wan diqulipe. Ev ji bo gel û kesan jî wiha ye. Ji ber vê ye ku xelkê gotiye: "Yê eslê xwe înkâr bike heremzade û ne ji me ye." Yanî tawanbar, binbâr û succar e. Belê, ne zû de, berî vê bi bîst û pênc -sih salan, wekî civak, wextî me navê xwe ji bîra kiribûya. Lê îro, wekî ku min di serî de jî îşaret pê kir, artêşa me êdî nema di nav sînorên Kurdistanê hiltê û qada şer xistiye nava xaka dijminê me jî. Me kurdan ji bo hemû dewletên dagirker û olên cûda leşkerî û fedatî kiribû, lê ji bo xwe me zêde tiştê nekiribû. Ger ez hinek mînak bidim. Me di nav refên tirkan de li Qore, Qibris û li Tirkîyeyê şer kiriye û hejmarek mezin ji me mirine û seqet mane. Ev xwîna ku me, di ber xelkê de rijandiye, çiqas gotina wê bi mirov zehmet jî be lê mixabin ew xwîn di avê de çûye.

Wê roja ku televizyonên tirkan cenazê wan şehîdan me yê ku çol û çolistan Antalyayê bi xwîna xwe pîroz kiribûn, nişan dan, ev fikir di serê min re derbas bûbûn. Ew hovîti û barbariya ku ji ekranên televizyonan herikibû, tesîreke ku mirov nikare tarif bike, li hemû gelê me kiribû. Ew mirovên ku dewlet û çapemeniya wê ya xwînvexwor, avares bi çavê wan de anîbû û dilê wan reş kiribû, li pêş çavê me, xwe li çeperên mirovahiyê didan û derbasî cîhana nemirovahiyê dibûn. İro dema min li Yekê Gulanê temaşe dikir, careke din rastî hovîtiya dewletê û hêzên wê yê sivil hatibûm. Gelo di navbera wê zihniyeta nemirovane ya li Antalyayê, ya li hemberî wî xortî û xwepêşandêrên Yekê Gulanê de çî ferq hebû? Bi van her du kirinan diyar bû, bê helwesta faşîstan li hemberî gelê kurd û kerdarên tirk çî ye? Ji bo bersivdayina vê hêza rûreş û lewîti dema yekîtiyê ye.



# Rojnameger Koray Düzgöre Medyaya tirk f

*Me ev hevpeyvîn berî sûkasta li dijî Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal pêk anî. Di daxuyaniyên Koray Düzgören, nîşaneyên êrîşên bi vî rengî diyar bûn.*

*Niha li ber we hemû rojname hene. Hûn rewşa dawîn a medyaya tirk çawa dinirxînin?*

✓ Wekî hûn jî dibînin. Em ê çiyê wê binirxînin. Nûçe nîn in. Nizanim Sibel Can çi kir, nizanim filan bêvan çawa ye...

*Magazîn bi pêş ketiye...*

✓ Na, ev ne magazîn e jî. Politikayek dane ber xwe û dimeşin. Jixwe Tirkiye, bi îradeya neteweyî nayê bîrêvebirin. Îradeya bürokrasiyê li Tirkiyeyê serdest e. Li Tirkiyeyê tiştêkî ku mirov pê ewle bibin nemaye. Di dewleteke hiqûqî de, tiştêkî ku mirov pê ewle û dîlfîreh bin darêzgeriya (yargî) serbixwe ye. Lê Tirkiye ne dewleteke hiqûqî ye.

*Hûn dikarin serbixwenebûna darêzgeriyê hinekî ronî bikin?*

✓ Dema ku ez dibêjim darêzgerî ne serbixwe ye, ez bi awayekî giştî dibêjim. Lê hin tiştên îstîsnayî jî hene. Wekî mînak, Metin Göktepe û her wiha Ciwanên Manîsayê. Gel reaksiyona xwe nîşan da. Yanî dema ku wîjdanê raya giştî bibêje, ev wisa naçe, mimkun e hin tiştên din yê îstîsnayî jî derkevin. Her wiha di vir de, divê em li DGM'yan miqate bin. Hin dadgeh hene xwe bi awayekî îzafî be jî serbixwe didin nîşan. Lê ji bo DGM'yan tiştêkî wisa ne gengaz e.

*Ji bo azadiya rojnamegeran rewş çawa ye?*

✓ Qanûnên ku azadiya rojnamegeran bi şnor dikin, ji aliyê avahiyên rojnameyê ve nivîsên nivîskar û rojnamegeran tînsansûrkin û tevî wê yekê zordariyek jî heye. Bi min, ev ji hemûyan girîngtir e. Em di van demên dawîn de li rastî van tiştan tînin. Li hin derdorên hinek mirov, der barê rojnamegerên muxalîf an jî rojnamegerên ku ne bi dîtin û ramanên wan re ne, raporên amade dikin. Ew kes, listeyan derdixin û bi wan listeyan patronên rojname û televîzyonan serwext (îqaz) dikin, dibêjin: "Ev zîlamên we me aciz dikin. Bila ev û ew kêman binivîsînin. Bila ev û yê din nenivîsînin." Zordariyêke bi vî rengî li ser patronan heye. Ji dêvla ku patron li ber xwe bidin, bi tevahî dibin dîlê wan kesan. Di heman katê, patronên medyayê van daxwazên navborî bi cih tînin. Aliyek heye ku berî serwextname (îqazname) biçê, ji bo ku ew xwe li ber dîlê wan şîrîn bike, hin kirînan jixweber dike. Medya ji bo standina îhaleyan bi dewletê re ketiye nav danûstanên gelekî kûr. Di çarçoweya van rûdanan de, nivîs-

kar û rojnameger nivîsên xwe sansûr dikin. Gelo ez li ser filan tiştî binivîsînim, ez ê ji karê xwe bibim? Ji sedî not hemû, di vê tîrsê de ne.

*Gelo bi we re tirseke bi wî rengî çêbû?*

✓ Bi min re tiştêkî wisa çênebû. Beriya her tiştî, tiştêkî ku ez wîndî bikim tune ye. Tiştê ku ji destê wî nivîskarî çû, ku zêde zerarekê nedê, divê netirse û bi ber wî tiştî nekeve.

*Mirov dikare bûyera Cengiz Çandar û yê din wekî mînak bide?*

✓ Belê mirov dikare bide. Lê belê bûyera Cengiz Çandar dêynin aliyekî, muhafazakarekî wekî Taha Akyol tê îqazkirin. Jê tê xwestin ku, ew li ser hin tiştan nenivîsîne. Ev, ji aliyê gelek kesan ve, tê zanîn. Belkî zêde di çapemeniyê de li ser nehatiye rawestandî. Muhafazakarî jî tîrî wan nake. Tê gotin ku 'Tu yê xwe bispêrî me'. 'Tu yê bibî parêzkarê me, ev ne bes e, ez çî bibêjim, tu yê jî wê bibêjî.' Di nav hin qadên dewletê de ev nêrîn xwedî giraniyekê berbiçav e. Hin hevalên me hene, 'Ka bila ev dem derbasibe' dibêjin. Lê wê hetanî ku derê biçin? Ev îqaz li hin kesan tînin kirin, ku qet em bîra wan kesan nabin. Lê dîsa jî li Tirkiyeyê ew tiştêkî asayî ye. Em di serdema McCarty de dijîn. Dibe ku rewşa îroyîn xedartir bibe.

*Gelo MGK ji rexneyan tengezar dibe?*

✓ Divê her sazî bê rexnekirin. Di demokrasîyan de rexne li hemû saziyan tînin girtin. Hin sazî, dema tu bibêjî destneda wan heye, jixwe ew tê wê wateyê ku demokrasî tune ye. Lê ji vê derê dema hemû sazî bî rexnekirin û tu jî bibêjî pêwîst e hemû sazî bî rexnekirin, divê ew ji aliyê kesên wekî me ve bî rexnekirin. Lê dema tu bi awayekî din tevbigêrî, li dijî rexneyan derkevî û tu nehêlî ku tu kes te rexne bike, çênabe. Di demokrasîyan de tiştên bi vî rengî tune ne

*Di nîqaşên li ser dewleta nehênî (Derîna Dewlet) de dihatê gotin ku ,mekanîzmayeke di ser MGK'yê re heye.*

✓ Rast e. Kar bi tenê ji aliyê MGK'yê ve an jî ji filan lijneyê ve nayê meşandin. Li gorî hin îfadeyan, hin hevalên me maxdûr ketin. Kes nizane ku çavkaniya wan ji ku derê ye. Hin hevalên me bi pêşdarazî hatin tawanbarkirin. Min ev yek hem di rojnameyan de hem jî di televîzyonan de anî zimên. Lê wan hevalên me ji bo min tu reaksiyon nîşan nedan. Bi taybetî bala we dikişînim ser wê.

*Hûn hewla Meclîsa Rojnamegeran çawa dibînin? Wê xebatên wê çî bin?*

✓ Çend kes jî hin bûyeran zivêr bûne û li hev civiyane. Ew jî ji ber xwe ve, pêk

hat. Ev platformek e. Di civîna me ya dawîn de, em gelek zêde bûn. Nêzikî 350 kesî. Lê belê ku hêviya çareserkirina problema etîk a rojnamegeriyê an jî problemên aborî dema jê bî kirin, ew tiştêkî ne cih de ye. Divê mirov ji tiştên biçûk dest pê bike. Lê belê divê helwesta xwe bi awayekî nîşan bide.

Eger em bi awayekî biryardar vî platformê bidomînin û daxwaza bi hevrebûnê ji xwe re bikin wekî çandekê, belkî bibe hêzek. Li gorî nêrîna min, divê em çanda piştigiriyê bi pêş bixin.

*Medya tirk dîmenên li derveyî ehlaqê rojnamegeriyê yê wekî gerîlayên li Antalya nîşan dide. Ev yek wê bandoreke çawa li ser gel bike?*

✓ Di medyayê de tiştên bi vî rengî çêdibin. Ez dikarim bibêjim ku medya karê fîtkirîne girtiye ser milê xwe. Lê belê tevî kişîşandina medyayê jî gel pêjînkariyê



şiyar e. Min bi xwe lê nekolaye, ez nizanim ka ew gerîla ne an kesên din in. Lê di warê binaxkirina wan de medyayê bi dehan caran ew dîmen nîşan dan. Ev fîtkirin e, ne tiştêkî din e. Lê gel guh nade wan. Ji firotina rojnameyan diyar e. Li Tirkiyeyê 65 milyon insan hene lê rojnameya ku herî zaf difroşe 200 hezar e.

*Piştî îfadeyên Şemdin Sakik medyayê bêhtir da navê...*

✓ Min nedîtiye. Dibêjin, ew îfadeyên Şemdin Sakik in. Gelo ew teslîm bûye an PKK ew teslîm kiriye. Ew jî ne diyar e. Lê di vir de ez dixwazim tiştêkî bibêjim. Mesela Öcalan dibêje, eger hêzeke çareseriyê hebe ew jî artêş e. Lê ku leşker bibêjin, em ê mesele çareser bikin, dîsa jî mesele çareser nabe. Meseleyek heye, dibêjin eger ji bo vî welatî komunîzm pêwîst be, em ê bînin. Rewşa herême bi hêsanî normal nabe. Xebatek hevgerî ya siyasî, çandî û civakî lazîm e. Eger vî çarê biryara qedandina şer bî dayîn, wê di nav artêşê de hin kes li dijî vî biryarê derkevin.

*Wê ev rewş heya kengê bidome?*

✓ Hetanî ku ev mesele derdorên berfireh yê Tirkiyeyê aciz bike, wê biçê. Êdî ev ji meseleyêke neteweyî derket, bû meseleyêke navneteweyî. Ev mesele bi pêşxistina aborî maborî naçe serî. Bi kiryarên antî-demokratîk jî kêşe ji holê ranabe. Li aliyekî dewlet dixwaze bikeve nav civaka rojavahiyan. Lê ew jî dibêjin: 'Tu here kêşeya xwe çareser bike. Pişt re were.' Dîsa zordayîna Ewropayê hin tiş-

**Hinek mirov,  
der barê rojnamegerên  
muxalîf de, raporên  
amade dikin. Ew kes  
listeyan derdixin û bi  
wan listeyan patronên  
rojname û televîzyonan  
serwext dikin û dibêjin:  
"Ev zîlamên we, me aciz  
dikin. Bila ev û ew kêman  
binivîsînin. Bila ev û yê  
din nenivîsînin."  
Zordariyêke bi vî rengî li  
ser patronan heye. Ji  
dêvla ku patron li ber  
xwe bidin, dibin dîlên  
wan.**



# Itnekariyê dike



zin nediyarbûn e. Digel vê yekê qanûnên ku ji aliyê vê rejîmê ve hatine çêkirin, heman kêşeyê bi xwe re tînin. Ew qanûn bi awayekî hev-girtî nayên bikaranîn. Ew qanûn li gorî kesan li gorî şert û mercan diguherin. Dema dewlet bêhiqûqiyê bike, tiştê nabe, lê dema hemwelatîyek bike, wî/wê davêjin zindanê. Dema hiqûq ne di ser her tiştî re be û darêzgerî ne serbixwe be, bûyerên bi vî rengî jî gelek asayî ne. Ji ber wê yekê carinan DGM ceza dide pirtûka ku kes nizane. Ev ceza jî çî re hatiye birîn. Ev nîşan dide ku azadî li Tirkîyeyê nîn e.

*Ji aliyê medyayê ve bûyera Olof Palme jî bi awayekî din hate nivîsandin. Hûn di vê derbarê de çî difikirin?*

tan bi wan dide gotin lê belê ger bibêje dê bi van yekan kêşe çareser bibe, nabe. Ji ber ku hûn jî bi mekanîzmayên di nav dewletê de dizanin. Kurd bi awayekî azad hê nikarin siyaseta xwe bikin.

*Gelo bi mirina Özal çareserî bêhtir bi paş ket?*

Belê. Eger Turgut Özal nemiribûya belkî hin tişt bikirana. Wî fêmkiribû ku berî çareserîya kêşeya kurdî, ew nikare li Tirkîyeyê tiştêkî bike. Ne di warê maf û azadiyan de, ne di warê aborî de û ne jî di warê têkiliyên navneteweyî de. Belê, hinek zilamên dewletê hene ku gelekî rehet in. Ew dibêjin: "Ji bilî şerê li Başûrê Rojhilat, li Tirkîyeyê aşî heye." Gotinên bi vî awayî eletewş in.

*Baş e. Li Tirkîyeyê kesekî di nêrîna Özal de heye niha?*

✓ Hene. Lê ditirsin ku ramanên xwe vebêjin. Ji bürokratê biçûk bigire hetanî yê herî mezin, qala ji hev cudanebûna welêt dikan. Der barê çareseriyê de jî min rojnameyên arşivkirî di ber çavan re derbas-kin, kêr hindik her tişt hatiye gotin.

*Hûn dibêjin gelek tişt hatine gotin. Rast e, ji bo qebûlkirina PKK'yê jî gelek pêşniyar hatine kirin. Lê ev yek li gorî zagona bingehîn qedexe ye. Çawa dibe ku di qanûnan de her tişt qedexe ye, lê evqas nîqaş û pêşniyar tên kirin?*

✓ Ev nakokîya Tirkîyeyê ye. Tirkîye ne tam demokrat e, ne jî tam faşîst e. Li gorî min, li Tirkîyeyê problema herî me-

Rastî li holê ne.

*Li gorî we berjewendiyên birjuwaziyê ji aboriya şer heye?*

✓ Belê heye. Ê aliyekî heye. Aliyek jî zirarê dike. Dibêje perê ku em didin bi avê de diçe.

*Mirov dikare ji medyaya tirk tiştêkî hêvi bike?*

✓ Ez tiştêkî hêvi nakim. Lê ku fersend bibîne, wê bikaribe serbixwe tev bigere. Yê ku dinivîsinin hene, lê berdelê wê jî didin. Di vir de reaksiyona xwendevanan jî girîng e. Li Tirkîyeyê reaksiyona xwendevanan nîn e.

*Wê ev rewş çawa biguhere?*

✓ Divê mekanîzmaya kontrolê hebe. Cihên ku lê demokrasiya heye, demokrasiya ji aliye hin hêzên din tên kontrolkirin. Li Amerîkayê polis ne melkêmot e. Ew jî dike û li kesan dixê. Lê mekanîzmayên ku malikê li wî polîsî mîrat dikan, hene. Hemû mesele ev e.

*Baş e. Hûn dê piştî van yekan çî bikin? We dil heye, hûn di saziyeye muxalîf de bixebitin?*

✓ Ez jixwe nivîsên xwe dinivîstinim. Nahêlim ku kes mudaxleyî nivîsa min bike. Lê tê noqteyê wisa ku, mirov hew dikare tiştêkî bike. Min 30 salî ev kar kir, ez hê jî dikim. Min tu tawîz neda û tu kesî jî, ez ji bîr û bawerîya min nexistim. Ji vir û pê de dibe ku ez hin riyên din bi kar bînim.

*Bi destpêka polîtîkaya marjînalîkirinê ya ji bo PKK'yê edî tiştên der barê kurdan de jî bi awayekî dijwar tên astengkirin...*

✓ Belê rast e. Ew, vê bi giştî bi şer ve têkildar dibînin. Berpîrsiyariya çapemeniyê ya rastî ew e ku, rastîyan derxe holê. Çapemenî çima piştîgiriya şer dike? Beravajî wê, divê muxalîf be. Muxalîf bûn çî ye? Nivîsandina rastîyan bi xwe ye, ne tiştêkî din e. Dema ku hûn vê yekê dikan, hûn li ber çavên hin derdorên dibin muxalîf. Çima? Ji ber ku rastîyên ku ew pêşkêş dikan, bi awayekî din in.

*Berî ku kêşeya li Bakurê Iraqê bê çareserkerin, kêşeya li Tirkîyeyê çareser dibê?*

✓ Ji aliye Tirkîye dibêje, ez alîgirê perçenebûna axa Iraqê me, ji aliye Tirkîye ve jî tu dibêjî qey, ew erdê Başûrê Rojhilat e, li gorî kêfa xwe faalîyetên xwe li wê derê dimeşîne. Ji ber ku dewlet li ser Bakurê Iraqê bîpolîtîka ye, esas ne tenê li Iraqê, bi awayekî giştî li ser mesela kurdî xwedî nerîna leşkerî ye. Ji ber vê yekê jî bo demê kin, li wê derê wekî eniyekê dinere. Ev nerîna leşkerî ye, ne ya siyasî. Dinêre mesele ji aliye wê ve xera dibe, PKK bi hêz dibe, operasyonêkê li dar di-xe, vêdîkişê dîsa dikeve wê derê. Lê da-

wiya dawî, ez jî wekî we difikirim. Her sê parçe ji aliye cografîk û civakî ve bi hev ve girêdayî ne. Lê wekî ez dibêjim, mesele bi nîqaşkirina demokrasiya û bi demokratbûnê ve girêdahî ye. Divê kurd jî di nav xwe de nîqaşê li ser vê yekê bikin. Du partî li ser wê erda biçûk hene. Hê jî li ser meseleyeke biçûk li hev nakin.

*Di nav artêşê de kesên ku rastiya şer dibînin ji holê tên rakirin. Gelo îro jî di nav artêşê de tasfiyeyeke bi vî rengî heye?*

✓ Belê belê. Jixwe di nav artêşê bi xwe de polîtîkayek heye. Zêdebûna nîqaşan û bûyerên din, girêdayî nakokîya ku di nav artêşê de ye. Qaşo artêş bi polîtîkayê re eleqedar nabe. Lê belê artêş xwe-rûtirin polîtîkayê (politikayê danîskasî) dike. Dema em Nurettin Fısunoglu dixwînin, em têkoşîna ji bo desthilatdariya Tirkîyeyê ya di nav artêşê de dibînin. Em dibînin, kesên ku di radeya bilind de ne, çawa ji bo terfî û tayîna hin kesan nameyên îxbarê dinivîsinin û ji Serokomar re dişînin. Hem polîtîkayekê bi vî rengî di nav artêşê de heye û hem jî di nav polîtîkaya Tirkîyeyê bi xwe de ye.

*Li Tirkîyeyê ji bo kurdan nîqaşa federasyonê heye. Hûn çawa dinivîstin?*

✓ Divê her tiştê bê nîqaşkirin. Tevî federasyonê. Wezîrê Karê Derveyî İsmail Cem li cihekî gotibû: "Belê, divê tiştên bi vî rengî bînin nîqaşkirin. Lê Tirkîye hê nehatiye asta wê nîqaşê. Ez ne li dijî nîqaşên bi vî rengî me." Wê Tirkîye kengî bê wê radeyê? Ez jî nizanim. Wekî min got; divê li Tirkîyeyê her tiştê bê nîqaşkirin, lê belê beriya pêşî divê kurd û tirk di nav xwe de, meselê nîqaş bikin û ji bo çareseriyekê, divê bingehê amade bikin.

*Baş e. Em bîjin dewletê biryara çareserîya kêşeya kurd girt. Berî ku nerîna mîlîtarîzmê bêtesîr bike, dikare kêşeyê çareser bike?*

✓ Bêguman pêwîst e, dewlet vî aliye li ber çav bigire. Heta ku wê nerîna bêtesîr nekin û polîtîkayên sîvîl û demokrasiya cihê xwe negirin, ew nikarin tiştêkî bikin. Ocalan jî dibêje, heta ku artêş nekeve nav meseleyê problem çareser nabe. Ez ne di wê baweriyê de me. Artêş jî ber sazûna xwe li hemberî demokrasiyê ye. Divê artêş jî di nav sînorên demokratîk de, cihê wê li ku derê be, divê li wê derê be.

Serkaniyê Giştî (genelkurmaylık) memûrek e. Lê ew îro di ser hemû partiyên siyasî re ye. Artêşa Tirkîyeyê biryarên stratejîk digire. Tiştêkî wisa çênabê. Hetanî ku artêş venegere ser karê xwe ye rastî, ev kêşe jî bi awayekî dirust çareser nabe.

**Divê her tiştê bê nîqaşkirin. Tevî federasyonê. Wezîrê Karê Derveyî İsmail Cem li cihekî gotibû: "Belê divê tiştên bi vî rengî bînin nîqaşkirin, lê Tirkîye hê nehatiye asta wê nîqaşê. Wê Tirkîye kengî bê wê radeyê? Ez jî nizanim. Wekî min got; divê li Tirkîyeyê her tiştê bê nîqaşkirin, lê belê beriya pêşî divê kurd û tirk bînin ba hev û jî bo çareseriyekê, bingehê amade bikin.**



# Çend û çend roj di jiyana pêxemberekî de

(1)

**L**i mûşiyê li hêviya otombilê bû. Ramanên wî mîna gêrikan diçin û tî, gid-gida wan di serî de bilind dibe. Li hêldora xwe dizivire, ew bi ber çavan dikeve. Nikare salên wî binase, çav dibêjin em ên kesekî sih salî ne, por dibêje ez çil im, dev û lêvên wî ên qurmiçî dibêjin, em ê kesekî heftê salî ne. Ev kesê sal nenas, erebaya xwe ya sê tekerî, bi her du destan tê vedide, li ser piştê wê somin nerm, çendek ji refê pêşîn ketine. Wî, piştî gereke dirêj, hinek somin firotibûn, di ber wan de çend şixat belawela bûne.

Cilên wî bi gemar, qirêj û qetiyane, hestû serî tê re hildane. Por sibirgeyê (melkes), di nav herdû milan de serî hildaye, belkî ne pore jî... Bi dîtina polisên belediyeyê re, wî xwe avête ser piştê erebanê û dema dît hambêz kirina wî ji sominan re bêsûde ye, her wê wan jî xwe re bibin, bi lez ew dixistin devê xwe, heya hişt ku çav ji cihê xwe bi der bikevin.

(2)

- Ez ê li ser vê danîştokê rûnim, na a din nêziktirî wê ye. Rûnişt lê wê ew nedît, wî jî ji bilî porê wê ye reş, ku şeveke zivistanê tîne bîra yekî, tu tiştî din nabîne. Di wê demê de zarokê di pêşiya wî re dibore, cilên wî ne cil in, qetiyayî û bi qirêj, porê guvrîşkî ne ji dê û bavê xwe girtî. Di baweriyaya wî de ye ku, tu caran şeh rîya porçê wî nedîtiye. Ev çi ye?

Li pêş wî erebaneyê wêranketî, ew sûsfiroşe, bi her du destan tê ve dide, lê bi rê nakeve. Hêza di mil û zandan de, nikare wê alava wêranketî bi pêş ve bide. Kesek ji cem jin û zarokên xwe hildibe, ber ku bi wî tê û berî bigihe cem, deng lê dike ku, bide dî wî. Mîna cewrikekî, stûxûz dike û di de pey wî kesî.

- Çima ev tişt xwe da". Wî xwest bigirî, belê giriyekî germ ku, bihêle ew ziwa bibe. Lê kanî ew singê ku karibe seriyekî wek ê wî hilgire.

(3)

- Mirov e.....?! Kesekî çil, pêncî û belkî heftê salî be jî, kesekî bêtemen e. Bi rastî yek nikare jê re bibêje mirov e, ne dîr e ku, leylana mirovekî be, ruwekî tenik di ser de çermine qermiçî, poç mîna rêlekê ye, tu çi dixwazî, tê di nav de bibîni, kurm û kêz, kevir û daran û ji aliyê cilên wî ve yek di kare

her tiştî li ser bibêje ji bilî ku karibe nav li wan bike cil in, gemar û pîsitiya li ser wan hiştiye ku ji hev neşelin. Li ber wî Xweda, fedîkar derdikeve.

Lawên Xweda, lawên evdu-lah we-rin binihêrin ku, çawa derence û cihwar belav bûne. Dema ku, nêzikî wî

lan tê de hene. Ew di nav wan re dibenze. Carekê cama vê, eynika din û a din û din mist dide. Stiriyan zivistana ku, zû hatî di laşê wî de tî xwar. Ew cilên tenik, nikarin li ber wan xwe bigirin. Digihe ber wê otombîla qurşînî, yeke pan û dirêj e, bi lez û hostekarî

bajêr û singê zaro diqelişîne.

(5)

Derdikeve ser balkonê. Dixwaze nirînekê ji keça cîran bidize. Tîrên çavan ber bi mala keçikê diherikin, derî girtiye lê dîsan jî ne qedexe ye ku, tê kevin hundir û bi stirî û neynûkên kulan, birîndar veker in. Wî kes li hundir nedît, dengê stranbêj û tembûran nebihîst. Lê van gulan gote wî ku îro, roja derxistina hevala zaroktiya wî ye. Di rojekê de, dêwekî ew bi rêve dîtibû û dema ku çavên wî pê dikevin, disekine û deriyê teksiyek reş jê re vedike.

Ew di cihê xwe de rûnişt û temaşa wan kir û kenekî reş barî.

(6)

Zukak, yeke ji jî zukanê bajarên mirîne ye. Katjîmêr devê kêrê ye roj û şevê, ken û girî dibire. Bûyer, etarekî sêv û porteqalan erebana xwe tê ve dide. Wê jî, bi destê zarê xwe girtî û rakas dike ku, wî bi dîr bixîne û çav nebînin. Lê ew mesmûta nedîçû. Çavên xwe ji wan bi der naxîne, girêz bi dev dikeve û bi hêz, destê xwe ji nav lepa dê bi derdixîne û êrişî ser wan dike. Dema etar dibîne ku, di nik wî de sekiniye û bi harî li barê wî dinihêre, ruwê xwe diguhere û hêşrek ji çavan tê xwarê. Ev çekên perîşanî, qelsî û gidîti kesî bi xwedî nakin.

Ew kes erebana xwe tê vedide, lê zaro xwe nagire, bi mêranî dest avêtê v û porteqalan, bi lez û tirs ew xistin hambêza xwe û xwest rê bibire. Lê otombîla ku, di ruwê wî de bi derdive, sêvan ji hambêzê diweşîne û qirînekê ji dilê dê dikşîne. Çend kesên nêzikî wê derê kom dibin.

- Sûcê zaro ye. Yekî got.

- "Bavo, ê zaroya bînin û nizanin wan çawa xwedî bikin." Ê din got.


- Zikan li hev du diwermînin, tuyê bibêje neslê kîvroşkan e. Sal yek zik yek û nabêjin em ê zikên van ji ku tijî bikin. Ê din jî got.

- Sedema vê yekê etar e eger ku, ew ne li vir bûba, tu tişt çenedibû, gerek e fermanek bi qedexbûna karê van cewirikan bi derkeve." Xweda jî got û wî çend sêv ji ên ku, zaro direvandin, xistin paşla Xweda.

(7)

"Xweda têr e, xew jê re xêr e." Wê sêvên diziyê xwaribûn.

PÎR RUSTEM/Heleb-88



Xêz: Nihat Türk

dibe, ji bêhna pîsitiyê gêj dikeve û kenekî bêsînor bi wî û bajarê ku paqij dike..... dike.

(4)

Çira sor e, divê otombîl rawestin. Li pey hev zîncîr girtin, ji hemû mode-

paçê di dest xwe de, di ser cama wê re digerîne û bi zanyariya xwedîkaran nas kir ku, nişana kesk nêzik bûye. Dev ji paqijîya wê ber dide û xwe digihîne nik xwediyê wê. Li ber çavên wî ye, lê berçavka reş xwediyê xwe bi tenê dibihîne. Pê li benzîne dike û rê,



Navenda Çanda Mezopotamyayê şaxa Stenbolê

● 16 gulan 1998 şemî: Konser, Gulên Mezrabotan, saet:14:30  
Konser, Hozan Xanemîr, saet:18:00

● 17 gulan 1998 yekşem: Konser, Koma Çiya saet:18:00

Sînema: "Bavê min li gera kar e (Babam İş gezisinde)"

Derhêner: Emîr Kustarika Dem:128 deqîqe dengdayin bi tirkî Mijar: Di film de qala Yugoslavyaya

1950'yî û serdema General Tito tê kirin. Film li "Festîvala Filman a Cannesê" xelata "Palmiyeya Zêr" wergirtiye, saet:18:00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



22 gulan 1998 in: Film: Darbe

Derhêner: Mick Jackson saet:18:00

Navenda Çanda Mezopotamya - Izmîr

16 gulan 1998 şemî:

Panel: "Girîngiya mezînbûna bi zîmanê zîmkarî (Anadille büyümenin önemi)", saet:18:00

17 gulan 1998 yekşem: Konser, Koroya NÇM' ya Izmîrê saet:18:00

22 gulan 1998 in: Konser: Hozan Xanemîr saet:18:00

## Mîhrîcana Malbatên Girtiyan:

# "Roniya çavan, xwêdana eniyan"



"Kûrê min, dema ez van xebatên ronîya çavan û xwêdana eniyan dibînim, heçkû ez bifirim û malê dinê hemû dibe yê min. Ka tu li van rengên kesk û sor û zer binêre, çiqas li hev tîn. Rast e! Zarokên min di girtîgehan de tune ne, lê xwediyê van tiştan tev zarokên min in!..."

Belê, wisa digot Dayîka Menîce, ku tevî pîrbûna xwe ya salan, ji Sultanbeyliya gundewarî, berê xwe dabû Modaya nûjen a Kadiköyê û hatibû mîhrîcana (kermes) piştgiriyê ya bo malbatên girtiyan.

TUHAD-DER ango bi navê xwe yê dirêj; Komeleya Piştgirî û Hekariyê ya Malbatên Girtiyan, roja 30'ê avrêlê li Navenda Çanda BEKSAV'ê ji bo piştgiriyê malbatên girtiyan mîhrîcanek li dar xist. Mîhrîcana ku wê heta 20'ê gulanê ji mêvanan re vekiribe, heta niha ji hêla bi sedan kesên welatparêz, derdorên çepgir û kedkaran ve hatiye ziyaretkirin. Der barê armanca vekirina mîhrîcaneke wiha de, Lutfiye Morsümbül ku yek ji rêveberên TUHAD-DER û endama malbata girtiyan e, wiha got: "Armanca me ev e ku, em hestên piştgirî, hevkarî û alîkariyê di nav malbatên girtiyan de zexim bikin û bihêlin ku ew bêhtir bibin afirîner."

Her wiha Morsümbül da zanîn ku, ew heta dawiyê li dijî pergala kapitalîzmê ne, ku dixwaze mirovên xwepereş û li hemberî bûyerên civakî bêdeng, biafirîne. Li hemberî vê yekê ji wê bilêv kir ku ew, bi nasnameyêke sosyalîst û welatparêz ku alîgirê dostayeti û hevkarîyê ye, vê rîya bi rûmet.

Lutfiye Morsümbül daxuyand ku, piraniya berhemên li mîhrîcanê ji hêla girtiyên ku di girtîgehên cur bi cur de ne, hatine çekirin û ev yek ji ji hêla mêvanan ve gelek watedar hatiye dîtin.

Morsümbül wiha dawî li gotinên xwe anî: "Tê xwestin ku insanên di girtîgehan de ne bêne tûnekirin. İnsanên ku bi tûnekirin û fitkiran re rû bi rû ne û disa ji berhemên wisa diafirin, tê wateya ku ew çiqas bi jiyane ve girêdahi ne. Em dixwazin ku her kes bê û van berhemên xweşik û watedar bibîne. Bi vê armanca em dê bibin şahîde naskirin û xweşbêsiya malbatan. Ev yek jî, ji bo me wê bibe mezintirîn dîlşahî û kêfxweşî. Jixwe armanca me ya bingehîn ew e ku, bi çalakiyên civakî yên bi vî rengî em gelê xwe bînin cem hev." Di mîhrîcanê de, ji bilî cil û bergên herêmî, aksesuarên çermîn, dantêlên ku girtiyên jin çekirine, wêneyên ku bi tayên rengîn li ser qûmaşan hatine nexşkirin, aksesuarên ku bi morîkan hatine çekirin û hwd. bala mirov dikîşînin ser xwe.

Me bi gotinên dayikekê dest bi van rêzan kiribû, em ê ji mêvanan bi gotinên Leyla dawî li vê nivîsê binin: "Bi rastî dema em li berhemên ku di girtîgehan de derdikevin û tene afirandin mêze dikin, divê em ji xwe şerm bikin. Ji ber ku ew di nav ew çend tengasî, alozî û bêderfêtiyan de, bi hestên xurt û baweriyên bêhempa, nixên heja dertînin holê. Îro berhemên vê pêşengehê jî, ji wan nirxan ne cûda ne"

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

## TÎŞK

### Dikana kitêbên kurdî Medya



OSMAN ÖZÇELİK

Yên ku Stenbolê nas dikin, Taksîmê jî dizanin. Vira Beyoğlu ye. Bi navê kevn Pera. Taxa kêf û zewqê. Berê Beyoğlu, bi ermen, bi rûm û bi rûsên spî bûbû sembola Stenbola rengîn. Îro şûna wan kurdên bêkar û bê-îş girtiye. Kurd ji welatê xwe yê dewlemend hatine qewirandin û li metropolan mecbûrî jiyaneke bêrûmet bûne.

Ger tu kurd bi û ji rojan şemî be, wê lehiya mirovan te jî Taksîmê bajo heta qada Galatasaray, nav dayikên şemiyê. Hûn dizanin windayî bi şûn de nayê. Armanca we, kezeba dayikên mayî neşewite.

Piştî belavbûna dayikan, an tu yê berê xwe bidî Navenda Çanda Mezopotamyayê an jî tu yê xwe bavêjî Pasaja Aznavurê. Ronahiyek te dikîşîne pasajê. Ronahiya Medya. Medya, navê dikana kitêbên kurdî ye. Xwediyê Medya Selehattin Bulut e. Dostên wî bi kurtafî, ji wî re dibêjin Seleh.

Seleh pêşkêşiya tiştêkî nû kiriye. Li ser kurdan çî kitêb, li ku derê hatibe çapkirin, Seleh lê digere, dibîne û tîne. Li Pirtûkxaneya Medyayê, kitêbên li gorî "bîrdoza fermî" jî di nav refên de cihê xwe digirin. Mirov nabîne, bawer nake. Tenê li Medyayê 800 celeb kitêbên li ser kurdan hene. Rojname, kovar û kasetên muzîka kurdî jî dikane dixemilînin.

Seleh, ji xwepesandinê hez nake. Mesela tu kesî nedîtiye ku, wî behsa xwe û jiyana xwe ya li Girtîgeha Amedê kiriye. Heşt salên giran yê bi îşkence û lêdan. Seleh pesnê xwe nade ku wî, jiyana û dîtinên rojnamevanê kurd ê ciwan û qenc şehîd Hafîz Akdemir di du cild kitêban de aniye ser hevdu û pêşkêşî dirok û pêşeroja kurdan kiriye. Seleh tenê li ser vekirina dikana Medya pesnê xwe dide.

Ji bo kitêbê bêne xwendin, ji destê Seleh çî tê dike. Rojên îmzeyan li dar dixe, nivîskarên tîne û wan û xwendevanan bi hevdu dide nasîn. Promosyaneke cuda heye. Kî ji Medya du kitêban bikire, Medya Alfabeyekê belaş dide wan. Alfabeya Kurdî...

Îsal berî 1'ê Gulanê bi çend rojan polîsên dewletê ajotin ser gelek-saziyan demokratîk. Bi taybetî jî saziyan kurdan.

Gava tîne Med-Komê, neh deh polîs dikevin hundirê Medyayê jî. Ku çavê wan li kitêbên kurdan dikeve, har û dîn dibin, tevan dirijînin erdê û bi postalan dieciqînin. Komîser bi ser polîs de diqire: "Tu yê kîjanê bibî û kîjanê bihêlî, ne yek e ne deh e. Divê mirov şevêkê dikane jî binî ve bişewitîne!" Komîser, vedigere ser Seleh û bi kitêba "Kürtler-B.Nikîtin" ya stûr li serê wî dide û dibêje: "Tu tenê kitêbên kurdan difiroşî, qet kitêbek jî xêrê re li vir tune? De bêje çima ûlann...!" Seleh dibîne ku Şêx Seîd, M. Mistefa Barzanî, Seyid Rîza, Celadet Bedirxan di bin postalen polîsan de dieciqînin, bersivê dide: "Belê, ez kitêbên li ser kurdan difroşim, ji ber ku ez kurd im û ez mîna van kitêban difikirim." Du-sê qolî kitêb û Seleh bi haqaret û lêdan dibin, du rojan dikin mêvan(!) û ber didin.

Nizanim bala we kişandiye? Dosya Susurlukê hate girtin û tu kes di girtîgehan de nema. Çeteyên dewletê bi ser ketin, her tişt ji nû ve kirin bin kontrola xwe. Û ji nû ve dest bi êrîşan kirin.

Xwendevanên Zanîngehê kuştin...Êrîş birin ser saziyan demokratîk...Rûniştina Dayikên Şemiyê qedexa kirin... Û.... Li Akın Birdal xistin...

Rojên dijwar li pêşya kurdan û hêzên demokratîk in.



# Keleha Xan

**M**îrê herêmê, fermanekê ji Hoste re dişîne. Dema ferman digihêje Hoste, ew bi kêf û şahiyê mezin, lê hinekî bi tengzarî, bi lez dipeke cem Mîr. Mîr, berê xwe dide girê, destê xwe bilind dike û dibêje Hoste: "Li ser gir kelehekê ji me re çêbike, bila di dinya-yê de her kes behsa wê bike û tu kes nikaribe dagir bike."

Hoste, fermana Mîr bi kêfxweşî dipejirîne û zû zûka dest bi avakirina kelehekê dike. Bi hemû hunermendiya xwe kelehekê, xweşik, zexm, asê û mezin çêdike, ku heta wê rojê keleheke wisa nehatiye dîtîn. Piştî ku kelehekê diqedê, îlamê mîr pê dixin. Lewre li Wanê Keleha Xoşabê hatiye avakirin. Gavekê şûn de, Mîr tê, lê dinihêre û devê wî ji hev diçe. Li ber delaliya kelehekê şaşwaz dibê; li her derê wê digere, bala xwe baş didê û di her gavê de hezkirina wî zêdetir dibê. Ev hezkirin wî dibe temahiyekekê kûr.

Piştî vekirina kelehekê di ber xwe de difikire, biryara xwe di ber çavan re derbas dike û dibêje: "Ê baş e. Ez ê milê hoste di ber de bidim jêkirin, da ku nikaribe carekê din tiştêkî wiha xweşik ji kesekî din re çêbike." Vê fermanê, ji kesên derdora xwe re diyar dike. Zilamên mîr Hoste digirin û milêkî wî di ber sermil de jê dikin. Piştî demekê, xemgîniya Hoste girantir dibê. Rojekê derdikeve hizûra Mîr. Rasterast dibêje: "Mîrê min! Min ev qas başîti bi te kir, te jî rabû milê min jêkir. Ez naxwazim êdî li ba te bimînim û li vê kelehekê binihêrim."

Mîr jê re dibêje: "Li cihê ku tirkmen lê ne nemîne. Ku tu tiştêkî wiha ji wan re çêbikî, ê milê te yê din jî bidim jêkirin."

Hoste lê dixe diçe Îranê. Li vê derê yekî bi navê Xan têkoşînê dide. Xan, li deşt û çiya, çol û pesaran, siwar û peya dimeşe. Geh ti ye, geh birçî ye. Lê xebata xwe digel hevalên xwe didomîne. Mehmûdkê Lêtanî di vê xebatê milê Xan ê rastê ye.

Rojekê Xan, li çolê leqayî şivanekî tê. Şivan şîr dotiye tasa xwe, li ser kulav di xewê ve çûye. Xan ber bi şivan ve diçe. Şivan di xeweke wisa şîrî de ye ku Xan nexwaze wî hişyar bike. Gavakê bi baldarî lê temaşe dike. Carekê dît ku meşek ji kelehekê derket, di qula bilûrê re derbas bû, çû ser tasa şîr geriya û vegeriya, dîsa di qula bilûrê re derbas-bû, çû nav kelehekê. Wê gavê Xan, pozê piyê xwe hêdika li navika Şivan dixê, wî diniçîne û hişyar dike.

Ku şivan şiyar dibê, bala xwe didê ku çar mîr li ser serê wî ne. Şivan nîzane ku Xan e. Jê re dibêje: "Te çima ez ji xewa şîrî hişyar kirim? Min xewneke pir şîrî didît."

Xan, jê dipirse: "Te çî dît, çî hat xewna te?"

Şivan bersiv dide: "Welleh min xewneke wisa xweş dît, min dikirî dîn bibûma. Min dît meşek digeriya. Dihât di difna (poz) min de derdiket, diçû qula bilûrê. Paşê çû ser goleke spî geriya. Wextê derdiket, diçû bi kelehekê da. Keleh ji tev xizna zêran e, tije zêr e. Xwezî min bizanibûy ku der e."

Serê xwe li vî alî, li wî alî dihejîne, dilê xwe diguvice.

viyê bala xwe didê, çend donim erd, digire. Pêşî hêrs dibê. Lê ku Xan mercên li hevhatinê pê dide fêmkirin, aş dibê. Xan bi qasî ku dikare eyarê ga vedike û zeviyê digire.


Haya mîr ji berê de, ji hosteyê Keleha Xoşabê ku hatiye aliyê Îranê, heye. Dizane li ku rûdine. Bi lez dişîne pey wî. Wextê hoste tê, ji Xan re dibêje: "Ez ê miljêkirî, feqîrê Xwedê, tu çî dawê li min dikî?"

Xan dibêje: "Gerek e tu kelehekê ji

Kaniya ku ava xwe jê vedixwin, nêzîkî kelehekê ye. Bi lûle û selean avê dikişînin nava kelehekê û riya avê vedişêrin.

Di her gerekî qora lêkirinê de, topekê diavêjin û qewîniya diwêr diceribînin. Hetanî ku kelehekê diqedînin wiha dom dikin. Gava ku diwar diheje, wê qorê xera dikin, ji nû ve lêdikin.

Hostê lêkirina kelehekê beriya wextê xwe xelas kir. Xan, hoste xwe bi kêf û şahiyê bêhempa xelat kir. Jê re dibêje: "Ey hosteyê min î delal! Te karê xwe



Lê serê Xan tevlihev dibê, şaş û metal dimîne. Pêşî ji ber xwe ve pey ji devê wî dertên: "Tu dîn î, ev çawa dibê?"

Şivan dibê: "Welleh ez nizanîm tu kî yî? Lê kê ev xewn bidîta, wê ji derdê van zêr û maretan (mucevher) dîn bûbûya."

Xan, gavekê şûn de, xatir dixwaze û diçe. Şivan jî radibe bi pey pezê xwe dikeve. Lê kes pê dernaxe ku Xan, sira ve xewna Şivan fêmkiriye.

Xan diçe cem xwediyê zeviyê û dibêje: "Zeviya xwe yê li kelehekê bifiroşe min."

Xwedanê zeviyê dibêje: "Ez nafiroşim." Xan dibêje: "Ez ê pir diravan bidim te. Pêdiviya min pê heye. Lê tu nafiroşî, ez ê gayekî serjê bikim, çermê wî bigurim, bi qasî çermê wî, zeviyê bidî min."

Xwedanê zeviyê dibêje: "Postê ga çiqas e, bêqîmet e! Lê Bila be."

Piştî ku li hev dikin, Xan ga tîne serjê dike. Postê ga bi cilêtê jê dike. Wekî pelê çixarê nazik dike ku xwedanê ze-

Keleha Xoşabê çêtir çêbikî."

Hoste xemgîn dibê û dibêje: "Min yek çêkir, milê min jêkirin."

Xan lê vedigerîne: "Gerek e tu çêbikî. Tu jî dizanî em doza xelasiya gel dimeşînin. Ji bo şexsê xwe em tiştêkî nakin. Ji ber vê yekê welatparêziya me ji tevan jî diyar e. Daxwaziya min di vê keleha asê de rûnem û li hemberî Îranê şerê xwe xurtir bidim meşandin. Bi sozê Xwedê, ez milê te nabirim."

Piştî ku baweriya hoste bi mîr tê, dibêje: "Ez jî soz didim te, Keleha Xoşabê, li ba vê kelehekê, wê wekî ku ji heriyê çêkiribin, xuya bike. Ez ê wisa zexm û asê çêbikim ku, li ba delaliya vê kelehekê, wê kes li Keleha Xoşabê nenihêre jî."

Hemû pêdiviyên kelehekê hatin peydekirin. Hoste, berî ku dest bi lêkirina diwarê kelehekê bike ji Xan re dibêje: "Xan, her ku min gerek danî, qor qediya, tu topekê biavêje. Ku qor bi lêdana topê biheje, qîmeta wî namîne. Ez ê wisa zexm çêbikim, gerek e nehêje." Piştî vê yekê dest bi lêkirina kelehekê dikin.

pêk anî. Tu hez dikî bimîne an jî here."

Hoste dibêje: "Bala min li te ye. Tu merivekî welatparêz î. Ez heta hebim, ez ê li ba te bim." Xan jî ku pê bawer bû, got: "Wê gavê ez ê sira ve derê ji we re bibêjim. Ev sir ji me û te. Mehemmedkê Lêtanî û du heb hevalên din pêştir tu kes ve nizanin."

Di her gotina xwe de baş bala xwe dida hemûyan û berdwam dikir: "Ev erda ku me li ser keleha ava kiriye, xezîneyaa zêran e. Qeneta min lê cebiriye ku, di binê ve axê de, bi qasî xaniyan, zêr û zîv û tiştên bi nîrx hene. Divê em lê bixebitin derxin û ji bo doza xwe xerc bikin."

Hemûyan bi xebateke bêhempa xwe dane kar. Bi şev û rojan şixulîn. Erd kolan, tat şikandin û bi ser xiznê vebûn. Piştî ku hinek zêr derxistin, Xan dibêje: "Bi lez, bi van zêran em şoreşa xwe xurt bikin. Mirovan kar bikin. Ên ku bin alîgir, bira werin di kelehekê de rûnin."

(Dûmahîk heye.)

MEM BOTAN



## Kovara akademîk a bi zimanê kurdî:

## Zend

Hejmara 4'an a kovara Zendê derket. Di vê hejmara kovarê de, li ser mijarê çur bi çur nivîsên lêkolînî cih digirin. Her wekî tê zanîn, ev kovara lêkolînî ji aliyê Înstîtuya Kurdî ya li Stenbolê ve tê derxistin. Di vê hejmara kovarê de, bi sê zaravayên kurdî; kurmançî, kirmanckî û kurmançiya jêrîn (sorani) nivîsan cih girtine.

Nivîsa yekemîn a ku di vê hejmara kovarê de cih girtiye, ji aliyê Serokê Înstîtuya Kurdî yê berê Şefîk Beyaz ve hatiye nivîsandin. Beyaz, di vê nivîsa xwe de li ser Newrozê lêkolînek kiriye. Di nivîsê de li ser dîroka Newrozê agahiyê balkêş hene. Navê vê nivîsê "Çend not li ser jêderka Newrozê" ye. Nivîsa Siraç Bilgin a li ser metodolojiya dîroknivîsînê, piştî vê nivîsa ku me li jor qala wê kir, tê. Bilgin, di vê nivîsa xwe de bi minakan li ser rêbaza lêkolînên dîrokî radiweste. Ev nivîs, ji bo kesên ku dixwazin li ser mijareke zanistî, bi taybetî jî dîrokî lêkolînê bikin, gelekî bikêr e. Piştî vê nivîsa Siraç Bilgin, lêkolîna Ahmet Kaya ya li ser koçberiyê tê. Di vê nivîsê tiştê ku balê dikişîne ev e ku, digel îstatîstîk û keda ku hatiye dayîn jî, di nivîsê zimanê akademîk ne diyar e. Zêdetir rengê nivîseke siyasî lê dikeve.

Li dûvê nivîsê, yekemîn nivîsa bi zaravayê kirmanckî tê. Ev nivîsa bi navê "Hetê vengsaziyê de averşiyayina kurmançî û kirmanckî" ji aliyê Samî

Berbang ve hatiye nivîsîn. Nivîs li ser bingeha zimanên Hînd û Ewropî yê kevnare wekî avestayî, sanskiritî, farisî (kevn, navîn û nû) û parthî (pehlewî), her du zaravayên zimanê kurdî; kurmançî û kirmanckî dide ber hev. Kesên ku dixwazin zimanê kurdî ji layê dengsaziyê ve nas bikin, dikarin ji vê nivîsê sûtê wergirin.

Nivîseke din a ku li ser zimanê kurdî radiweste, ji aliyê Zana Farqînî ve hatiye nivîsandin. Farqînî di vê nivîsa xwe "Ji aliyê binyadî ve lêkerên me" hildide dest. Birek lêkerên ku heta niha zêde nebûne mijara lêkolînan, bi vê xebata Zana Farqînî zelal û sayî dibe.

Di vê hejmara kovara Zend de yek ji balkêştirin nivîs, Hevpeyvîna Gabar

Çiyan a digel keşeyê asûrî Gabriel Işık e. Ev hevpeyvîn li ser "Cejnên asûrî-suryaniyan ên toreyî û olî" ye. Di vê nivîsê de mirov dikare tê-

kiliya di navbera çanda gelekê kurd û gelekê asûrî de jî baş bibîne. Bo nimûne Işık dibêje "li vê cografîyê ewr û ez-mên" bûne.

Xebateke ku rengê akademîk daye kovara Zendê, lêkolîna Gülseren Deniz e.

Wê, li ser anatomiya mirovan xebatek kiriye û navên azayên laşê mirov bi kurmançî nişandane. Xebatên bi vî rengî ji bo kesên ku dixwazin bi zima-

nê kurdî berhemên li ser tenduristiya mirovan bidin gelekî bikêr in.

Di vê hejmara de tekane nivîsa bi zaravayê kurmançiya jêrîn, ji aliyê Ehmed Şerîfî ve hatiye nivîsîn. Ev nivîs li ser giyayên hekîmiya gelêrî ye, navê nivîsê "Tuwêjwanîk le mergij û giyay dermanî û pizîşkeyatî resen û suninetî le Kurdistan" e.

Ji bilî van nivîsan Feqî Huseyin Sağnîç nivîsa xwe ya li ser zimên di vê hejmarê de jî didomîne, nivîsa Zülküf Kışanak "Dîroka başûrê Kurdistanê ya Nêzik (II)" jî di vê hejmarê dewam dike. Di vê hejmara kovara Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Zendê de, nivîseke li ser dîrokê jî ji aliyê Îsmet Şerîf Wanlî ve hatiye nivîsandin. Wanlî li ser dîroka dîroknivîsînê agahiyê hêja dide. Wekî din nivîsa Torî, "Lêk û dawineyên kurdî", nivîsa Mehmet Reşit Irgat, "Lêgerînek li ser Meleyê Bateyî", nivîsa Edibe Şahin "Viren ra nika cînû û 8'ê Adarê", nivîsa Kerem Soylu "Ji şaristaniya Arya ber bi kurdan" di vê hejmarê de cih girtine.


Di vê hejmara kovarê de, pîrbûna wergerên ji zimanê tirkî balê dikişînin. Bi taybetî kesên ku dikarin bi kurdî bi-nivîsîn, lê bi tirkî nivîsandine divê bîn rexnekirin û divê ji bo geşedana xebatên lêkolînî, rê li ser vê nêzîktêdayina çewt bê girtin. Dîsa di vê hejmarê de pîrbûna tashîhan jî balê dikişîne.

SERWISA ÇANDÊ



## Îro wext e

MEDENÎ FERHO



Derengman çêtir e ji nekirinê.

Beşê wê çil salî, mirovekî kohne, ku di serhildanên bê-encam û têr wêranî de cihê xwe girtibû, heya dawiya temenê xwe jî, kula welêt di ser dilê wî de, mîna kunêreke têr îledarî runî tibû, ev gotin gotibû. Nexweş bû, bi çavên pir melûl li dora xwe dinihêrî, sê mêr û ez bûm... Yek kurê wî bû, her du ciwamêrên din biraziyê wî bûn. Min gelek caren bihiştiye, di çîrok û çîvanokên kurdan de jî pir minak hene, ku kalê malê, sermîyanê malê dikeve nava livînên mirinê de, zarokên xwe, birazî, pis û pismamê xwe li dora xwe dide hevûdin û şîretan li wan dike. Wilo xuya dikir ku, vî mirovê gorbihîşt jî, bi wê armançê bang li kur û biraziyên xwe kiribû.

Lê belê, tiştê girîng gotinên wî bûn ku ez dixwazin bînim zimên. Tiştê girîng didu bûn. Yek ji wan gotinên li ser Mem û Zînê bûn. Yê din der barê jiyana û rewşa kurdan de bûn. Mînakê Mem û Zînê, ji biraziyê xwe yê biçûk re digot: Ji ber ku ew li serxetê bû. Piştî serhildana Bagokê malbat teva binxet bûbû, lêbelê biraziyê biçûk, piştî deh, yazdeh salan

vegeriyabû ser cih û warê bav û kalan. Dema vegeyabû temenê wî, sêzdeh, çardeh sal bû. Lewre dewleta tirk û hevkarên hingî ku wekî çavîkên niha roleke gelekî xerab pêk dianîn, dengê xwe nekirin. Wê demê tiştên enteresan li Tirkiyê diqewimîn û çend ciwamêran dixwest tevgerê xweser bikin. Biraziyê kalê kohne jî di nava wê tevgerê de bû û li ber mirinê, li apê xwe mikur hat. Mirovê kohne û şîretkar wiha got:

"Ji me nehat em tiştêkî bikin. Me bi nezanî û bêtiyaqiyê mala xwe jî, mala gelek kurdan jî xera kir. Mîna mîr Sêvdîn ku çarenûsiya me ketibû destên wan, mîna Mem û Zînê bi bêmiraziyêkê têr xwîn em tîkçûn. Çima min mînakê Mîr Sêvdîn da; Ji ber ku Mîr Sêvdîn erk bû, lê bi rola xwe ranebû. Qeretaçdîn Bextê cihanê bû, lê belê feleka xayin Beko Ewan zora wî bir. Cihana gewrik Zînê stuxwar û dilsotî ma, jiyana ciwanîk Mem jî jiyana ciwanîk bû, di bin tunê têr şermezarî de mir. Berî ku hûn dest pê bikin, hewl bidin bê hun leşkerê xwe amade bikin. Ku ne bi serferberiyek koçûmal be, Kurdistan xelas nabe. Hûn jî mîna me nekevîne nava şaşitiyan." Piştî çil salî, ev-şaşitiyê ku kalê kohne digotin, mîna ayîneya bi efsûnî li ber çavên min in. Lê belê kalê kohne tiştêkî din got: "Nebêjin em dereng mane. Kengî be, çi wextî be, xwe bigihînin heval û hogirên xwe. Derengmana hawarê, çêtir e ji nekirinê."

Kalê Kohne nekirin tiştêkî gelekî kirêt didît. Derengman jî mîna poşmanî ango şiyarbûnê dinirxand. Mîna îro ku gelek ciwamêr li hem-

berî tîkoşîn û raperîna gelê kurd radiwestin, geh mênha îdeolojî didine pêş, geh mênha kiryanan didine pêş. Guman dikim ku her gotin û galegal jî bo avruwê tê gotin. Bar ne barê kesî ye, yê tevahiya kurdan e. Kes di vî karî de jî nikare tu mineta li kesî bike. Mêrê çê dest dihilîne, mêrê nêr jî mîna hespê derî celeban mayî dihire...

Erka Mîr Sêvdîn, ku îro di çarenûsiya gelê kurd de rola xwe bi cih tîne ne bêhêvî ye. Bext û dilsoziya Qeretaçdînê hemdemî, bi canfedaiyêkê bê gotin û bêbersiv binbariya xwe, di encameke cengawerî de tînine zimên. Cihana Gewrik Zînê, bi qîrên û awaza Zekiya, Ronahî, Bêrvan, Zilan Raşhan û Bermal bûne find û çira û alavê Newrozê, li ber raperîna cemawerê kurd pêdikeve. Jiyana Ciwanek Mem jî, îro rola Qeretaçdîn pêk tînin. Feleka Xayin Beko Ewan rola xwe ji her demê bêhtirîn tîne cih. Lê belê ew kesên ku li sernavika xwe dibirîn, çima bi rola Memê stuxwar ranabin, nizanîm. Le bendeyî çi ne, kê riya welatê dibin agir û jehr û ji quma dijimînê dirinde de û kar li ber wan girtiye.

Derengman çêtir e ji nekirinê.

Derengman jî nûjen de rahiştina bar û kirina çalakîyan e. Nekirin di navbera çavî û mirina bi saxîti de pîvaneke bêwate ye. Ji vê kêlikê bêhtir pêdiviya gelê kurdbi kesan nîn e. Bêhtirîn jî vê kêlikê hewceyîya welatê Kurdistanê bi mirovên çê çênabe. Kesê ku îro hewl nede û damistonka xwe nedeyne ser agirê raperîna azadî û serxwebûnê, di paşerojan de nikare bête ber tîna wî agirî jî.



# Rizgarbûn

**S**erokomarê Tirkîyeyê Süleyman Demirel, Serokwezîr Mesut Yılmaz û Serokê Giştî yê DYP'ê Madam Çiller, li balafirekê siwar dibin û bo komcivînekê diçin Stenbolê. Di ser gund û bajaran re difirin. Çiller, li xwarê dinihêre û bi awayekî ji nava xwe têr dibêje:

– Hemwelatîyên me yê nê xizan hene. Ger ez a niha sed milyarî bavêjim xwarê, dê sed kes ji xizaniyê rizgar bibin.

Sebra Yılmaz nayê û di cih de li Çillerê vedigerîne:

– Ku ez du sed milyarî bavêjim, dê du sed kes ji xizaniyê rizgar bibin.


Demirel li benda keysa xwe ye û bi awayekî ji xwe razî:

– Ku ez jî sê sed milyarî bavêjim, dê sê sed kes ji xizaniyê rizgar bibin.

Pilotê balafirê jî li wan guhdarî dike. Hew sebra wî tê û di ber xwe de dibêje:

– Bi rastî ku a niha, ez we hersêkan bavêjim xwarê, dê şêst û şeş milyon kes ji xizaniyê rizgar bibin.

ADAR JIYAN



## Bila serê xwe ji bîr neke

Mela Meşûr û dostekî wî li hev û din rast tîn. Wekî her car dostê Mele dibêje:

– Seyda, rojekê tu nehatî mala min û te qehweyeke min venexwar. De sibê bi xêr ez li mal im, kerem bike, were em bidin û bistînin.

Mela xwe girê dide û diçe mala dostê xwe. Li derî dide, bermaliya dostê wî derî vedike û dibêje:

– Kerem ke seyda! Belê zîlamê min ne li mal e. Berî niha bi saetekê ji mal derket û çû.

Lê Mele serê zîlam di şîbakê de dibîne û dibêje:

– Ku zîlamê te hate malê, gelek silavên min lê bike, lê gava ku ji mal derdikeve û bila serê xwe di şîbakê de ji bîr neke û bi xwe re bibe!

## Ez xwe ray kê bidim?

Melayê Meşûr dizewice.

Wekî ku adet e, bûka serbixêlî, li ser doşekê rûdine û li hêviya Mele dimîne.

Gava ku Mele tê xêliya bûkê ji ser rûyê wê dide alî, yekcar bi bêdengî, dîsa xêliya bûkê di ser rûyê wê de wer dike. Peyre piştî xwe dide bûkê û radikeve.

Serê sibehê, bûk ji Mele dipirse:

– Te ji min re tiştê negot. De ka ez, ji îro pê de xwe ray (nîşanî) kê bidim û xwe ray kê nedim?

Mele zêde narêse û dibêje:

– Hurmet, ji bo Xwedê! Tu xwe ray min nedî, ray kê didî bidî!

## BI XELAT...


## XAÇEPIRSA BI XELAT (120)

## XAÇEPIRSA

Şirî H	Şirî X	Şirî A	Şirî A	Şirî S	Şirî G
HAL	LUK	GER	GER	ER	
Şirî S	Şirî I	Şirî N	Şirî Î	Şirî D	Şirî Ü
SING		NI		DU	
Şirî N	Şirî E	Şirî Ş	Şirî E	Şirî T	Şirî A
NABİ		PİŞE		TA	
Şirî K	Şirî L	Şirî N	Şirî Y	Şirî K	Şirî P
KOLN		YK		PN	
Şirî Z	Şirî R	Şirî Z	Şirî A	Şirî E	
ZIRZA		EMEG			
Şirî Ü	Şirî R	Şirî H	Şirî F	Şirî E	
URHFE					
Şirî E	Şirî N	Şirî A	Şirî S	Şirî Ü	Şirî R
ENASÜR					

### Bersiva Xaçepirsa 118'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 120'an pirtûka Müslüm Yücel Kürt Basın Tarihi 'tekzip' e.




**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmarê 118'an pirtûka Nejdî Buldan a bi navê 'Yasaklı Topraklar' qezenc kirine ev in: Şennur Kılıç/Sakarya, A. Vahap Bal/İzmir, Medeni Alpkeya/Amed, Ayten Amed/Mêrsîn, M. Hüseyin Doğan/Ereğli

Hate qetilkirin (wêne) Nebatîyek	Her gav Deng	Dawera Hidrojenê Tîpek	Tir û ... Amûreke muzîkê	Cüreykî dar Dengdarê 'Ron'	Xeyal
Şitlên sewzeyan		Amûreke ristîne	Mêzekirin Fêkyek		
Xeber		Dijwar			
		Şarîstaniyê kevn Ordî			
Tîpek	Serhildêr Lê genim tê hêrandin		Melodî		
Rewinda			Firaqa ber kûçikan		
			Dawera potasyomê	Hevraz	
Hincet		Çadır	Diyarde	Tebîni, not	
Paş-girekek		Pêvekirin			
	Bawerîyek				
	Cinavkeke şanidanê				
Xwarînek			Tîpek		
Hêl			Bi reqema Romayê pêncî		
		Se. kûçik			

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8





**WELAT**  
 ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
 (Haftalık Gazete)

■ Li ser navê  
 Gündem Basın ve  
 Yayıncılık  
 San. Tic. Ltd. Şti. (adına)  
 Xwedî (Sahibi)

■ ÇAPXANE  
 Yeni Asya Matbaacılık  
 A.Ş.

■ BELAVKIRIN  
 BIRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYÊN ME  
 (Temsilcilerimiz)

München:  
 (Nünerê Götî yê Ewropayê)  
 Mahmut Gergerli  
 Tel: 49 871 672 29  
 Fax: 49 871 670 815

■ Brüksel:  
 Medeni Ferho  
 32 532 721 12 03

■ Swîsre:  
 İhsan Kurt  
 Tel-fax  
 41 21 652 76 07

■ Bonn:  
 Ahmet Baraçkılıç  
 49 228 66 17 40

■ Hollanda:  
 S. A. Fewzi  
 31 104 85 55 43

■ Suriye:  
 Jana Seyda  
 Helim Yüsiw

SELAHATTIN DELI

■ Yönetim Yeri  
 Çakırğa Mah. Sorgucu  
 Sk. No:11/6  
 Tel: (0212) 530 01 40

■ Büroya İrtibatê  
 (İrtibat Bürosu)  
 Ayhan Işık Sk. No:23/3  
 Beyoğlu/İSTANBUL  
 TEL: (0 212)  
 251 79 37-251 90 13  
 FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Weşanê  
 (Yayın Yönetmeni)  
 SAMİ TAN

■ Berpîrsê Karên  
 Nivîsaran  
 (Yazı İşleri Müdürü)  
 M. SALİH TAŞKESEN

# 'Vengê İHD'yo nêyero virnayin'

Cayê ciya û ciya seba lanetkerdina na vardayine nûmayiş û mîfîngê viraziyê. Azadîwazanê kurd û tirk keyberê neweşxaneyê ke Akın Birdal te de maneno ver de kom bî û ebi sloganan rayedaranê dewleta tirk protesto kerdî.

Roja 12 gulanî de saet 12'yê di-hîrî de di kontrayê dewleta tirk mabêndê İHD de, da Serokê Mafên Mardiman Akın Birdalî ro. Na vardayin de ganê Birdalî, ebi 8 guleyan 14 ca de bi dirbetin. Embazanê ci bah-doyê pancês deqey de, ebi jew ambû-lansa Birdal berdî Nêweşxaneyê Sevgi. Birdal na neweşxane de nezdiyê panc saet tepiya ameliyat ra vejyê. Goreyê vatenanê doxtoranê ci hewna jî rîskê weşîna ci nêravêdo.

Akın Birdal û 90 embazê ci sera 1986'î de paytextê Tirkiya Anqera de İHD na ro. A ser ra na het, waştoxê mafê mardiman Birdal, çagirotey û serokateyê İHD keno. Eke Tirkiya de, eke Kurdistan de beno qandê mafên mardiman, fikr û waştanê xo ebi zîwaneko akêrdeya her gi roj tayna vêşî êşkerekêrd. Nê çend seriyê peynî de jî qandê aşî zaf xeftiyayê. Ey dewlet ra vindardîna vardayinê lêşkerî waştê û wina vate: "PKK di finî adir birna, la belê dewlet verpersê nê adirbirnayîyanan nêda. Ewtîya de zaf weş ayseno ke, dewlet wazeno no lec dom bo. La belê şarê ma û şarê Kurdistanî nêwezano no lec veşî veraver şiro. Ma ewro aşî wazem."

Qandê ney vardayinî Tirkiya û Kurdistan de ebi des hazarana aşîwazî kewtî kuçeyan. No çend rojiyo ke aşîwazî kuçeyan ra nêvejiyayî. Kîştî bîn ra jî zaf sazî û kesan na vardayin lanet kerd. Partîyan ra HADEP, ÖDP, SİP, EMEP, BP û komeleyê kurdan û sosyallîstan dazanayinên xo vila kerdî û waştanê xo ardî zîwan. Endamê nê şaxan û aşîwazî, Birdalî qet tenya nêveradane û Nêweşxaneyê Sevgi ver de şew û roj pawenê. Cagenoyê Serokwezîrê

Tirkiye Bülent Ecevit, Wezîrê Karê Zerî Murat Başesgioğlu, Waliyê Anqera Erdoğan Şahinoğlu jî şiyî nêweşxaney. Aştîwaştoxan kêberdê nêweşxanî ver de îna protesto kerdî. Nê endamanê dewletî ra qe jewerî jî qandê kîştoxan çiyê nêardî zîwan La belê Serokê Pêrî-nî ê PKK Abdullah Öcalanî, na vardayin sero wina vat: "Waştoxê mafên mardiman, dostê tirkan û kurdan, merdimo erjiyayî Akın Birdalî rê selamanê xo rişena û ci rê weşîna weş wazena Mayê fina vînenê ke çimê kîştoxan fina sûr biyo. Na vardayin, hemverê birateya şaranê ma amewo ca. Kamî Sakık ard Tirkiya û kamî rojnaman de heqê Birdalî de xeberanê zûrî nûsnayî înan guleyî nayî Birdalî ro. Kîştoxî werte de yê, iyê Anqera de yê. Ma fina jî waştîna xoya aşî ra nêabirmeyenê."

Cayê ciya û ciya seba lanetkerdina na vardayine nûmayiş û mîfîngê viraziyê. Azadîwazanê kurd û tirk keyberê neweşxaneyê ke Akın Birdal te de maneno ver, kom bî û slogananê zey; "Qetîl dewlet", "Ma pêro Akın Birdal ê!", "Hemverê faşîzmê paştî bidim jûbîn!" eystî û rayedaranê dewleta tirk protesto kerd.

Stenbol de şaxê Komeleyê Mafên Mardiman ver de, ebi hazaran mardimanê demokrat û şoresger amey pêser û no karê lîminî şermezar kerdî. Rojanê Jûyîn de nêzdiya di hazar mardim amey pêser, heta Meydana Taksîm ra-

verşiyayin viraştî. Meydanê Taksîmî de hetê sermiyanê İHD'ê de jew dazanayin amey wendin. Edî êşkerekêrdin de amey vaten ke, Sermiyanê Komeleya Mafên Mardiman Akın Birdal ebi destê kîştoxên faşîst biyo dirbetin. Roja 13'yê gulanî nezdiyê des hazar kesî keyberê İHD'ya Stenbolî ra, heta keyberê Liseya Galatasaray raversiyayin viraşt. Slogananê zey "Mayê faşîstan ra hesab pers kirê!", "Vengê İHD nêyenê virnayin!", "Kutikanê Çatliyi nêşênê ma bitersnayê!" û "Ma her jewerî, jew Akın Birdal ê!" eystî û tepîştina kîştoxan waştî. Bahdo persbenoyê İHD'yê Stenbolî Turgay Kaya dazanayin wend. Kayayî da zanyin ke, Akın Birdalî qandê aşîwazan selamî riştî û vat: "Ma zey parêzkaranê mafên mardiman aşî, demokrasî û azadî wazenê û hetê şarê bîndest, çinê bîndest û cînsê bîndestî genê." Turgay Kaya, dewlet ra waşt ke kîştox edî demê kilmêrin de bêrê



tepiştin."

Goreyê dazanayinê İHD, roja 16'yê mengî oyo sey hazar merdim şiro Anqere û dewleta tirk protesto kiro.

A. WELAT/ŞTENBOL



# O Du 2 mehên dawîn de 6 helîkopter û balafirek hatin xistin Operasyon nikarin têkçûnê veşêrin

**A**rtêşa tirk di operasyonên xwe yên îsal de, bi giranî hêza xwe ya hewayî bi kar tîne.

Li gorî agahiyan, helikoptereke artêşa tirk ku dixwest li Eyaleta Botanê li Çiyayê Spî leşkeran deyne, ji aliyê gerilayên ARGK'ê ve hate xistin.

Li gorî ajansa nûçeyên DEM'ê roja 10'ê gulanê li ser xeta di navbera Çiyayê Spî û Metîna de leşkerên artêşa tirk, ku derketibûn operasyonê, bûn hedefa êrişên gerilayên ARGK'ê.

Yekîneyên artêşa tirk ku dixwestin li sînorê Kaşûrî çavdêriyê pêk binin, ketin bin çavdêriya gerilayên ARGK'ê.

Di heman demê de, helikopterên şer ji, leşker danîn herêmê. Di encama gulebarana gerilayan de, helikoptereke Sikorskî ku dixwest li derdora Zavîte leşker deyne, derbe girt.

Li gorî agahiyan, agir bi helikopterê ketiye û li nêzî Çiyayê Spî ketiye. Li herêma Botanê, di operasyonên van 2 mehên dawî de, 5 helikopterên tirk di encama gulebarana gerîla de, li derveyî şer mane. Her wiha li Amedê jî, balafireke şer ya tîpa F-4 hatibû xistin.

Her wiha tevgera leşkerî ya artêşa tirk li herêmê hîn jî berdewam dike. Hate ragihandin ku, piştî xistina helikoptera şer a artêşe tirk, di encama êrişên gerilayan de, gelek leşkerên tirk hatine kuştin. Gerilayên ARGK'ê li bêtêlên leşkerên tirk guhdar kirine û li gorî daxuyaniya gerilayan ji bilî leşkerên di helikopterê de komeke din ya leşkerên tirk jî di heman herêmê de hatine kuştin.

Ji aliyê din ve, di heman herêmê de li gundê Aşûtê yê caşan, li ser girê Kadûn leşkeran mayin danîne, caşekî bi

navê İsmail Edîs, pê li mayinê kiriye û miriye.

Dîsa li gorî agahiyan caşên tevî operasyonê bûbûn diyar kirine ku, di operasyonên her du hefteyên dawî de, gelek leşkerên tirk hatine kuştin. Her wiha caşên li herêmê dan zanîn ku îtîrafkarê bi navê Celal ku tevî operasyonê bûbû, ji aliyê leşkeran ve hatiye kuştin.

Çavkaniyên ARGK'ê diyar kir ku operasyonên artêşa tirk ne bi 40 hezarî, lê bi qasî 80-100 hezar leşkerî pêk hatine. Her wiha heman çavkaniyê ragihand ku dewleta tirk Şemdin Sakîk jî di vî 'operasyona Murat' de bi kar tîne û ji Elezîz, Palo heya navçeya Erxenî ya Amedê û Bilîsê ketina nava tevgerê.

Artêşa tirk yekîneyên xwe yên ku ji vî herêmê bi paş ve dikişîne, li herêma Êlih û Mêrdînê bi cih dike, da ku di rojên pêş de, êrişî ser başûrê Kurdistanê bike. Di vî navberê de, caşekî ku ji herêma Licê tevî operasyonê bûbû, da zanîn ku, di nava van du hefteyên dawî de, gelek leşkerên tirk hatine kuştin. Her wiha heman caşê ku nexwast navê xwe bide, kuştina îtîrafkarê bi navê Celal ku bi destê leşkerên tirk pêk hatiyê, peyitand (tesdîqkirin).

## PKD pêwendiyên xwe yên qirêj bi dewleta tirk re didomîne

Piştî ku kontrayên tirk li başûrê Kurdistanê dest bi êrişan kirin, di heman demê de jî çekdarên PDK'ê li hemberî ARGK'ê dest bi êrişan kirin. Bêriya hefteyekê li nêzî Çiyayê Spî ku li nêzî herêma bajarê Duhokê ye, çekdarên PDK'ê li hemberî gerilayan kemîn danîn û di encama êrişê çekdarên PDK'ê



de gerilayê bi navê Rênas jiyana xwe ji dest da.

Ji aliyê din ve roja 10'ê gulanê li nêzî Gunde Banîkê ku girêdayî Navçeya Batûfayê ye çekdarên PDK'ê dîsa êrişî birin ser komek gerîla. Di vî êrişê de gerilayên ARGK'ê yên bi navê Ferhat û Serhat jiyana xwe ji dest dane.

Li gorî çavkaniyên gerîla ev demek dirêj bû ku PDK'ê xwe kişandibû navenda bajarên. Ji serê salê û vir ve, ev cara yekemîn e çekdarên PDK'ê êrişên bi vî rengî pêk tînin. Gerilayên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan diyar kirin ku pêwendiya van êrişên PDK'ê bi kontr-gerilaya tirk re heye.

## Ji ARGK'ê banga ji bo PDK'ê

Ji aliyê din ve ARGK hefteya borî daxuyaniyek dabû û ji bo hêzên Başûrî

hevkarîyê bi dewleta tirk re nekin, bang li hin derdorên kiribû.

Gerilayan di daxuyaniya xwe de diyar kiribûn ku dewleta tirk kontra PDK di nav hevkarîyê de ne. Bêpîrsên ARGK'ê dibêjin ku heke ev êriş berdewam bikin, ew jê wê bersivê bidin. Her wiha tê gotin ku dewleta tirk dixwaze bi van hewldanên xwe li başûrê Kurdistanê kontrola xwe zêde bike û bibe desthilatdar.

Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan ARGK'ê wiha bang li gel kir: "Dewleta tirk hem li bakurê Kurdistanê û hem jî li başûrê Kurdistanê dixwaze gelê Kurdistanê ji holê rake. Li hemberî listîkên dewleta tirk hişyar bibin û wezîfeyên xwe yên welatparêziyê bi cih binin."

NAVENDA NÛÇEYAN

# "Roja 19'ê gulanê emê bi hev re bin!"

Cezaya ku DGM'yê li Rojnameya Ûlkede Gündemê biribû û 10 rojan girtina wê hatibû xwestin li Dadgeha Rajorîn a 8. hate selmandin. Li gorî vî caze-yê weşana Ûlkede Gündemê 10 rojan hate sekinandin. Rojname wê roja 19'ê gulanê bi xwendevanên xwe re be.

Ev cezaya ku di pêvajoya germ a ku ji aliyê dewleta tirk ve operasyon û şerê psikolojik tê meşandin, hate înfazkirin, ji ber nivîsa Serokê Giştî yê DEP'ê Hatip Dicle a bi navê 'Drama Dêrsimê' li rojnameyê hatibû birin.



Ji aliyê DGM'ya 2. ve tê îdîakirin ku nivîsa di vî nivîsê de 'gel teşvîkî hevrikî û dijmintiyê dike.'

Her wiha Bêpîrsê Karên Nivîsaran ê Ûlkede Gündemê Hayrettin Demircioğlu jî hate cezakirin. Li Demircioğlu salek hepis û 960 hezar cezayê pereyan

hat birin. Cezayê Demircioğlu wergerandin 5 milyon 370 hezar pereyê tirkan.

Serdozgerê Cumhuriyetê der barê Hatip Dicle de jî daxuyaniya tawanbarîyê da.

## Rêlibergirtin û zordariyên li ser rojnameyê bêrawest-an dom kirin

Rojnameya ku 7'ê tîrmeha 1997'an dest bi weşana xwe kir. Li nûçe, nivîsên quncik û îlanên 248 doz hatine vekirin û hema hema hemû hejmarên wê hatin berhevkirin. Girtina rojnameyê ji aliyê derdorên demokratîk ve bi tundî hate şermezarkirin.

## ROJNAMEYÊN HATINE GIRTIN

20 kewçer-Avrêl 1993: 131 hejmar derketin. Ji van 58 hejmar ji aliyê DGM'ê ve hate berhevkirin û derheqê wê de bi sedan doz hatin vekirin. Yekî Ûlke Di avrêla 1993'yan de dawî li weşana xwe anî.

30 gulan 1992-14 avrêl 1994: Li gel cezayên din 39 hejmar hatin berhevkirin. Di 14'ê avrêla 1994'an de hate girtin.

28 avrêl 1994-3 reşemî 1995: Ji 230 hejmaran 225 hejmar hatin berhevkirin. Bi hinceta ku dîmahîka Özgür Gündemê ye hate girtin. Roja ku 3'yê berfanbarê bi 4'ê berfanbarê ve girê di-de navend û büroyên wê hatin bombekirin. Ersin Yıldız şehîd ket.

13 avrêl 1995-17 tîrmeh 1995: Ew rojname di nav rojnameyên kurdan de ya ku herî zêde hatiye sansûrkirin e.

12 berfanbar 1995-3 gulan 1997: Rojnameya Demokrasiyê di roja Çapemeniya Azad de hate girtin.